DİJİTAL KÜTÜPHANE KANALI

# Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

**RESMİ WEB SİTEMİZ**

**https://rantey.org**

Yedek ve Duyuru Kanallarımız
Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

• Telegram: https://t.me/birkitapbir

• WhatsApp Kanalımız : https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4IvMoc0Y

Kenan Güneş

# MAMIKÊN ME

Rêza Pirtûkên Kurdî-18



EVRENSEL
BASIM
YAYIN

https://rantey.org

EVRENSEL
BASIM YAYIN

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Kenan Güneş

# MAMIKÊN ME

Lêkolîn- Berhevkarî

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

**DOĞA BASIN YAYIN**
**Dağıtım Ticaret Limited Şirketi**
Tarlabaşı Blv. Kamerhatun Mah. Alhatun Sk. No: 25 Beyoğlu / İstanbul
T: 0212 255 25 46 F: 0212 255 25 87
www.evrenselbasim.com - info@evrenselbasim.com

Evrensel Basım Yayın **530**
Rêza Pirtûkên Kurdî **18**
**Mamikên Me: Kenan Güneş**

Redaksîyon: İsmail Dindar
Wêneyê Bergê: Burhan Deniz
Amadekirina Bergê: Devrim Koçlan

**ISBN 978-605-5315-60-3**
© Evrensel Basım Yayın 2013 - Sertîfîka No 11015
Çapa Yekem Gulan 2013 • Stembol

Çap: Ezgi Matbaası Sertîfîka No: 12142
www.ezgimatbaa.net - ezgimatbaa@maynet.com
Sanayi Cad. Altay Sk. No: 10 Çobançeşme-Yenibosna / İstanbul

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MAMIKÊN ME

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*SIPASÎ: Di vê xebatê de, keda pir kesan heye. Ji Wanê dostên hêja Şuayp Orhan û Ebûbekir; ji navçeya Basa birêz Selîm Kalfa; ji Qereyaziyê mamoste Mahpûs; ji Cizîrê Kekê Dûndar û mamoste Eşref; ji Semsûrê mamoste Hecî Sağlık; ji Norşînê hevalê Zana; ji Qerecdaxê mamoste Remezan; ji Şernexê hevalê Şîrzat û sê xwendekarên hêja ên Lîseya Anadolûyê; ji Pîranê mamoste Ayhan û gelek hevalên din…..ji bo keda van hevalan gelekî sipas dikim.*

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## NAVEROK

*Mamik (Tiştonek-Meselok-Metelok-Tiştanok)* ........ 9
*Hinek Taybetmendiyên Mamikan* ........ 21
*Tiştonek-Mamik (Têderxıstınok-Metelok-Meselok-Çik Çiko)* ........ 25
*Çîbenok - Çikçiko* ........ 138
*Varyantên Hinek Mamikan* ........ 143
*Çend Mînakên Pirsên Mantıqî* ........ 166

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

# MAMIK (TIŞTONEK-MESELOK-METELOK-TIŞTANOK)

Mamik, leyîstikeke hişmendî ye. Di vê leyîstikê de pirsîna tiştekî şênber an jî razber ya ku hinek taybetiyên wê hatine dayîn heye. Ev pirsîneke hengdar e. Kesê ku mamik jê tê pirsîn di demeke kin de bi kelecan hewl dide ku bersiv bide. Ji ber vê jî di hişê xwe de zanîna xwe û xeyalê xwe datîne ber hev û ji vana wêneyan çêdike. Bi vî awayî dixwaze zûka bersivekê çê ke. Dibe ku mirov di ber bersivdayinê de biweste, lê ev westîn kêf û zewqê dide mirov.

Derbarê mamikan de çend kesan nêrînên xwe wiha aniye ziman: Birêz Mihemed Elî[1], ji bo mamikan dibêje: "Tiştonek (mamik) cureyekî lîstik û pirsên devkî ye ku zîrekî û şarezayiya mirov pê tê pîvan". Wêjevanê ewrûpî Friedreich ji bo mamikan viha gotiye: "Mamik, pêşkêşkirina tawlipancik (nerasterast) ya tiştekî nediyar e. Kesê ku mamikê dixwîne an jî guhdarî dike, bi hişê xwe hewl dide ku wê tiştê bibîne". Wêjevanê bi navê Star vê dibêje: "Mamik leyistikeke hişmendî ye ku wesf û taybetiyên tiştekî bê ku eşkere bête gotin lê têgihiştina wê hesantir kirî radixe ber çavan".

Mamik, berhemên wêjeya zarokan e. Gel, bi vê rêbazê xwestiye zarokên xwe ji aliyê hijmendî ve jîr bike û wan fêrî tiştên ku li derdora wan hene bike. Pirsîn û bersivdayina mamikan ji bo zarokan piranî weke pêşbaziyek e. Lewre zarok heta ku ji milê wî tê zîrekiya xwe nîşan dide û bi vî awayî xwe bi hevalên xwe re hevberî (muqayese) dike. Mamik, ji aliyê têkiliya ziman-zarok ve jî risteke pir giring digire ser

1 Ji Kovara Tûrik



Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

xwe. Bi navbeynkariya mamikan zarok zimanê dayika xwe bi awayekî zelal û paqij dinase û fêr dibe. Li vir pêwîst e em vê jî bibêjin: Her çi qas mamik berhemên wêjeya zarokan be jî ne tenê jibo zarokan e. Bi taybetî di nava kurdan de kesên navser jî bi mamikan re eleqeder in.

Li ser rista mamikan hinek tiştên din jî tên gotin. Yek ji wan gotinan jî ev e: Tê angaşt kirin ku zemanê berê di pirsgirêkên civakê de mamikan ristekî çareseriya bêxwîn dileyist. Aliyên ku ji bo şer dihatan li hemberî hev bi pirsîna mamikan hêzên hev û din diceribandin. Di bersivdayinê de kîjan berek serkeftî bûya di şer de jî ew serkeftî dihata pejirandin. Bi vî awayî pirsgirêk bê xwînrijandin çareser dibû.

Mamik, hem li gor avabûna xwe hem jî li gor ahenga xwe dişibe helbestê. Lewre hinek caran weke cureyeke helbestê jî tê pejirandin.

Ji aliyê mijara xwe jî mamik pir dewlemend in û tu sînor jî ji xwe re qebûl nekiriye. Ol, civak, ajal, tiştên ku rojane tên bikaranîn, tiştên razber û şênber, xweza û hwd gelek tişt bûye mijar ji mamikan re. Hinek caran mijarên ku di nava civakê de qedexe ne jî hatiye bikaranîn.

Mamik, yek ji berhemên herî kevnare yên wêjeya devkî ya gelêrî ye. Mamik, di serî de her çi qas ji aliye kesekî ve hatibe çêkirin jî di nava demê de dibe berhemek gelêrî. Di nava gel de hê jî kesên ku mamikan çê dikin henin.

Mirov û jiyana mirov her dem diguhere, li gor pêdiviyê hinek tişt ji nava jiyana wî derdikevin, hinek tişt jî tevlî jiyana wî dibe. Li gor vê pergalê mamik jî an ji ziman derdikevin an jî tevlî ziman dibin.

Di nav kurdan de her herêm ji bo mamikê peyvekî cuda bi kar tîne. Li Botanê peyva "*mamik*", li milê Serhedê "*tiştonek*", li Semsûrê "*tiştik*", li derdora Amedê "*tiştanok*" û li hinek deverên Pasûrê "*meselok*", li milê Culemêrgê "*metelok*" û her wekî din li hinek deveran jî "*têderxistinok*" tê bikaranîn. Li gor ferhenga kurdî[1] li hinek deran jî "*kelemamik, çistan, pêderxistinok, qinik* û *apik*" tê bikaranîn. Di kurdiya dimilkî de, li Dêrsimê "*çînorek*" di dimilkiya li derdora Amedê de "*çik çiko*" û li gor ferhenga kirmanckî[2] jî "*çibenok* û *mertal*" tê bikaranîn.

1 Farqînî Zana, Ferheng,enstîtiya Kurdî ya Stenbolê, 2007.

2 Grûba xebate ya vateyê, Ferhengê Tirkî-Kirmanckî, Vate, Stenbol, 2009


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Li welatên din ên dinyayê ji bo mamikan navên tên bikaranîn wiha ne: Di zimanê ingilîzî de “riddle; word puzzle”, di fransizî de “devinette; énigme”, di almanî de “Rätsel”, di îspanî de “acertijo; crucigrama; eni”, di zimanê îtalî de “indovinello”, di zimanê erebî de “*hezora*”, di tirkî de “*bilmece, mûamma*” di farisî de “*mûamma* û *çîstan*”.

Mamik, li gor avabûnê (sazîbûnê) di esasê xwe de, ji sê beşan pêk tê. Ev her sê beşên hanê li hemû hereman bi heman şeklî tên bikaranîn. Ev beş wisa ne:

A- *Beşa neqerat (dîsgotin):* Her mamik bi beşa neqeratê dest pê dike û her herêm jî, bi neqerateke xwe ya taybet dest bi mamikan dikin. Li vir pêwist e em gotina xwe zelal bikin. Her çi qas em dibêjin “neqerat” jî, lê ew gotinên ku neqeratê pêk tînin li her herêmê kêm an ji zêde diguhere. Ev neqerat; li Anatolya navîn “*Tiştakî min heye* an jî *Molko min tê...*”, li Semsûrê “*Tiştikî min heye*”, li Dihê û Miksê “*Mam(i)kê mino*”, li Şirnexê “*Mamkê minê mamanî*”, li Qilabanê “*mamgî minî mamanî*”, li Amed, Batman û gelek deverên din jî “*Tiştekî min heye*” an jî “*Tiştekî min heye tiştanî*” û di kirmanckî de jî “*Çîk esto*” ye. Mînak:

*“Mamkê mino*
*Mirîşka dirûnê*
*Radibe hêk nakê, çi ye?*

(textik-kursî) Dihê

B- *Beşa danasînê:* Di vê beşê de taybetmendiyên tiştên ku werin pirsîn tête dayîn. Ev taybetmendî dibê ku şênber an jî razber ; hêsan an jî zehmet bin. Di vê beşê de carina peyvên bêwate jî ango peyvên li gor rêzbendê (qafiyeyê) li hev hatinê tê bikaranîn. Di van peyvan de pêwist e, mirov ne li wateyê, lê li ahengê binêre. Em dikarin bibêjin beşeke giring a mamikan bi vî awayî pêk tê. Mînak:

*Hatim hêt û hêt*
*Min lê nêrî li min bû pêt?*

(çiya) Dihê


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Xişt û mişt*
*Çû dergehê rûnişt?*

(milkis, melkes) Dihê

*Hilkutî milkutî*
*Şêx Zeyneba dûv rûtî?*

(mişk) Dihê

*Hilindir milindir*
*kur ji bavê bilintir?*

(ker û hêstir-agir û dûman) Pasûr

*Zîq û zîq*
*Du ling û heşt çîq?*

(cotyar û ga) Pasûr

Di vê beşê de taybetmendiyên têgeh, tişt an jî kesan bi hunera wêjeyî tête dayîn. Ev hunerên wêjeyî piranî îstîare, dirûvandin (teşbîh) û tenasûp (lihevî-peyvên bi hev re eleqeder) in. Mînak:

*Qutiya silêmanî*
*Li ser xanî?*

(jina bi zaro) Qereyazî

Di mînaka jor de zikê jina bizaro dirûvê "qutiya silamanî" dide. Li vir tişta ku dirûv dide (ê ku dişibe-benzeyen) "zikê jina bizaro" ye û di rêzikê de eşkere nehatiye bikaranîn. Tişta ku tê şibandinê (hatiye şibandin-kendisine benzetilen) "qutiya silêmanî" ye û di rêzikê de derbas dibe. Lewre hunera îstîare hatiye bikaranîn.

*Koka wê di erdê de ye*
*Nava wê di dewar de ye*
*Serê wê di mirov de ye?*

(genim) Farqîn

Di vê mînakê de em dibînin ku peyvên "kok, nav û ser" peyvên ku bi hev re eleqedar in hatiye bikaranîn. Ji ber vê jî di vê mînakê de hunera tenasûp heye.


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

C- *Beşa pirsînê*: Ev beş, beşa dawiyê ya tiştonekê ye. Mamik piranî bi pirsa "Çi ye?" bi dawî dibin. Mînak:

*Mamikê mino*
*Pazê amo*
*Li devê çemo*
*Sibê rabû*
*Kit jê nemo, çi ye?*

(stêrk) Wan

Hin caran jî mamik rasterast weke pirsekê ji rêzê tê pirsîn. Mînak:

*Mamgî minî mamanî*
*Aşê dêm, çi ye?*

(saet) Qilaban

Hinek mamik jî ji bo ku kesê ku mamik jê tê pirsîn têxe rewşeke zehmet de bi gotinênku bi  xweşiya mirov neçin bi dawî dibe. Mînak:

*Mangî minî mamanî*
*Kurtan e*
*Heçî nezan heywan e, çi ye?*

(pir) Qilaban

*Wek stêrkan diçirûske*
*Deriyê wê wek brûsk e*
*Rondik davê wek nîsk e*
*Li ser dileqe brû û bisk e*
*Kî ker nebe, wê naske, çi ye?*

(çav)

Em dikarin bi çend awayan mamikan dabeş bikin:

1- Ji aliyê hejmara rêzikan (pêkhatinê-sazîbûnê?) ve

2- Ji aliyê pirsyarî ve

3- Ji aliyê aheng û qafiyê ve

1- *Ji Aliyê Hejmara Rêzikan ve Mamik (Tiştonek):* Ez ê vê beşê li gor   hêjmara rêzikên ku mamik pêkaniye vebikolînim.Li gor vê:


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*a) Mamikên yek rêze*: Ev cureya mamikan ji bilî rêzika neqeratê bi tenê ji yêk rêzikê pêk tê. Lewre taybetmendiyên tiştên ku tête pirsîn, pir naye dayîn. Ji ber ku ev mamik yekrêze ne piranî bê qafiye ne. Mînak:

*Mamkê mino*
*Çûk firî sîtil li mila, çi ye?*

(deravî-beravî) Dihê

*Mamkê mino*
*Kêçê spîndarek rakir, çi ye?*

(kuncî) Dihê

*Tiştekî min heye*
*Çavê ga li kadînê. Çi ye?*

(hîv, heyv) Pasûr

*b) Mamikên du rêze* : Ev cureya mamikan ji bilî neqeratê (dîsgotîn) ji du rêzikan pêk tê. Mînak:

*Tiştekî min heye*
*War û war*
*Çar pê ne dewar, çi ye?*

(dolap) Pasûr

*Mamkê minê mamanî*
*Sîniya savarê*
*li ser guhê darê, çi ye?*

(hinar) Şernex

*c) Mamikên sê rêze:* Ev cureya mamikan ji bilî neqeratê (dîsgotîn) ji sê rêzikan pêk tê. Mînak:

*Mamkê minê mamanî*
*Serhilû ye ne mar e,*
*grêkodel e ne dar e,*
*giya dixwe ne dewar e. Çî ye?*

(kûsî-şkêvlatûk) Gundikê melî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Tiştek heye*
*Vî alî dar e*
*Wî alî dar e*
*Di nav de sekî har e, çi ye?*

(şûr) Pasûr

*d) Mamikên çar rêze:* Ev cureya mamikan ji bilî dîsgotînê ji çar rêzikan pêk tê.

*Mînak:*
*Mamkê minê mamanî*
*Çil çîk in,*
*çil berçîk in*
*çil ode ne*
*çil kilîle ne. Çî ye? (pîvaz)*

Gundikê Melî

*e) Mamikên pênc û zêdetir rêze:* Ev cureya mamikan ji bilî dîsgotînê ji pênc an jî ji zêdetir rêzikan pêk tê. Mînak:

*Tiştekî min heye*
*Ji goşt û hestî ye*
*Pênc şax û bi destî ye*
*Sed û yek huner lê ye*
*Li heywana pê ye*
*De bêjin ev çi ye?*

(tilî û dest)

*Hêlo mêlo*
*Simbêl belo*
*Mîna kala*
*Xwe da pala*
*Şirqîn ketê*
*çû ezmana, çi ye?*

(şilî-barîn) Qereyazî

2- *Ji Aliye Pirsyariyê ve Mamik (Tiştonek):* Di vê xalê de em ê li ser pirsyariya mamikan bisekinin. Li gor vê jî em dikarin mamikan wisa dabeş bikin:


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*a) Mamikên biyekpirsê*: Di van mamikan de taybetmendiyên tên dayîn tevahî ji bona pirsa bi tenê tiştî ye. Mînak:

*Mamkê mino*
*Kaloyek tê ji deştê*
*barê striyan li piştê, çi ye?*
(Jûjî, jîjo)

*Mamkê mino*
*Kaniya qinê qinê,*
*mîr û beg dest didinê, çi ye?*
(Poz)

*b) Mamikên bidupirsan:* Di van mamikan de taybetmendiyên tên dayîn ji bona pirsîna du tiştan in. Mînak:

*Mamkê mino*
*Ga orî*
*pişkul firî, çi ye?*
(Tiving û gule)

Dema em li mînaka jor binêrin em dibînin ku teqîna tivingê şibandiye "orîna ga" û derketina guleyê jî şibandiye "firîna pişkulê". Ji ber vê jî du pirs çê bûne.

*Tiştekî min heye*
*Çi xaniyek damiştî,*
*bilbil tê de rûniştî, çi ye? (xanî: dev û bilbil: ziman)*

*Mamkê minê mamanî*
*Şil bike,*
*rep bike,*
*tê re bike. Çî ye?*
(ta û derzî) Gundikê Melî

*c) Mamikên bisêpirsan:* Di van mamikan de taybetmendiya sê tiştên bi hev re têkildar tête dayîn û pirsîn. Divê bête zanîn dema pirsên mamikan zêde bibe zehmetiya wan jî ew qas zêde dibe. Lewre ev mamik li gor ên din piçekî zortir e. Mînak:


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Tiştekî min heye*
*Bîr çermînî*
*Av axînî*
*Dewl darînî, çî ye?*

(Bîr:kildank; av: kil; dewl: kilçov)

*Parçekî nan da lawikê kumsor*
*Lawikê kumsor da rêza esker*
*Rêza esker avête çala g..?*

(1.ziman; 2.diran; 3.mîde) Farqîn

*d) Mamikên biçarpirsan*: Di nav cureyên mamikan de mamikên herî zor, tevlîhev, tawlipancik, bedew û ciwan ev in. Mamik, piranî ji bo zarokan in, lê ev cûre ji bo mezinan e.

*Neçandî li ser pişta nezayî*
*Nezayî li ser pişta nelebit*
*Nelepit li ser pişta netebit?*

*(neçandî: xwê,*
*nezayî: hêstir (qantir),*
*nelebit: pir,*
*netebit: av) Basa*

*Bi banî ketim du gulên geş,*
*Bi banî ketim du marê reş,*
*Bi banî ketim meydana xweş,*
*Bi banî ketim ev zala hûta?*

(1.çav, 2.birî, 3.enî, 4.por)

*Şîrînok li darînok,*
*Darînok li guhbelok,*
*Guhbelok bi rê ket,*
*Dunigo pê ket?*

*(Şîrînok: Dims.*
*Darînok: Pal.aqol*
*Guhbelok: Qantir (Hêstir)*
*Dunigo: Çerçî)*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*e) Mamikên hêjmarkî:* Ev cureya mamikan bi leyîstina hejmaran pêk tê. Ev leyîstok, leyîstokeke gotinî ye. Dema ku ji mirov tê pirsîn, mirov bêbiryar dimîne ku ka çawa hesap bike û bersiv bide.

*Neh mih(mî)*
*Deh Beran*
*Yazdeh şivan*
*Dozdeh kûçik*
*Eviya çend dike?*

(dozdeh heb) Pasûr

*Mamkê mino*
*Sê pênc panzde*
*û dido hivde*
*û sisê bîst?*
*Dike çend?*

(bîst e)

*Çar û çar û çardeh*
*Bîst û pênc û pazdeh*
*Hivdehê ku du hejdeh*
*Dike çi qasî?*

(115)[1]

3- *Ji Aliyê Aheng Û Rêzbendiyê (Qafiye) ve Mamik (Tiştonek):* Weke tê zanîn mamik, berhemên wêjeya devkî ye û piranî xîtabê guh dike. Ji ber vê jî di mamikan de fonksiyona aheng û qafiyeyê pir giring e. Gava ku em li mamikan dinêrin em dibînin ku di piraniya wan de, di navbera rêzikan de qafiye heye.

*Ji şekir şêrintir e,*
*ji hesin girantir e?*

(xew)

1 Gazî Mustafa, Dîsko Dîsko Danîno, Enstîtiya Kelepora Kurdî, 2006, rp. 14


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Şem û şepal e*
*Serjêkirin betal e*
*Her sê dînan helal e?*

(masî)

*Kurê kerê*
*Çû ser bênderê*
*Kayê dixwê*
*Nadê kerê?*

(mirovê kund û tima)

Di hinek mamikan de, di navbera rêzikan de qafiye tune ye. Dibe ku berê qafiya van jî hebû lê di nava demê de bi gotina çewt ji holê rabûbe. Mînak:

*Sofîkî ûr pehn*
*Xwe diavêjê ser d...*
*te heta dibe sibeh?*

*(nivîn)*

*Ez çûm şikeftekê*
*Tê de mişt e kopalê kenêrê*

*(cureyeka dar)*

*Yek kêr nehat ez destê xwe bigrim?*

*(şîxê bizinê-qiloçê bizinê) Qilaban*

*Di mamikên yekrêze de qafiye nîn e. Mînak:*
*Mamkê mino*
*Kêçê spîndarek rakir?*

(kuncî)

*Mamkê mino*
*Çûk firî sîtil li mila?*

(deravî)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

Ji aliyê şematîk ve jî rêzikên mamikan wiha bi hev re qafiyê datînin:

*Bazînê sitiyê* ------x
*Xwe avêt deviyê?* ------x

*Ji darê ye* -------x
*Ji berê ye* -------x
*Ji biznê ye?* -------x

*Serî reş e* -------x
*Binî reş e* ------x
*Destavêjim* ------y
*Berdavêje?* ------x

*Hem hema* ----x
*Ber çema* ----x
*Ne gur dixwê* -----y
*Ne diz dibê?* -----y

(aş)

*Hewa re difire* -----x
*Perê wê tune* -----y
*Dimîne (mîna-weke) şekir e* -----x
*Tama wê tune?* -----y

(berf)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## HINEK TAYBETMENDIYÊN MAMIKAN

1- Qafiye, wek tê zanîn bi adetî tê dawiya rêzika helbestê û di mamikan de jî ev taybetî wisa ye. Lê di hinek mamikan de em dibînin ku qafiye di serê rêzikê de jî heye. Mînak:

*Yek Serî,*
*Yek pênc,*
*dudu tije,*
*Yek vala?*

(Xwedê-nimêj-bihuşt û dojeh-dinya)

*Bi banî ketim du gulên geş,*
*Bi banî ketim du marê reş,*
*Bi banî ketim meydana xweş,*
*Bi banî ketim ev zala hûta?*

(1. çav, 2. brû, 3. enî, 4. por)

2- Hinek mamik bi gotinên xwe dişibin gotinên pêşiyan. Mînak:

*Gayê zer li kû de were mexel*
*Salekî giya tê de heşîn nabe?*

(agir) Basa

3- Hinek mamik dişibin pirsên mantiqî. Mînak:

*Pênc bira ne*
*Birê mezin çar salî ye*
*Ê dû wî dihe salî ye*
*Birakî dû wî heşt salî ye*
*Ê dinê dû wî pênc salî ye*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Terî (herî) dû giya (hemû) deh û sê salî ye, ev çi ye? (nimêj) Semsûr-Kolik*

*Sê tişt hatin ser pirê*
*Yek li pirê mêze dike*
*Dibîne û pêlê dike derbas dibe*
*Yek jî mêze dike*
*Dibîne û pêlê nake derbas dibe*
*Ê din jî ne dibîne ne jî pêlê dike*
*Lê derbas dibe. Ev çi ye?*

(jineke bizaro û zarokek di hembêza wê de) Qereyazî

*Qazî bi qîza xwe va*
*Mela bi jina xwe va*
*Çar sêv bi darê va,*
*her yek yekê jê dike,*
*yek dimîne pêva? Çawa?*

(jina mele qîza qazî ye) Semsûr-Kolik

4- Dema em li mamikan mêze bikin em ê bibînin ku hinek mamik bi temamî herêmî ne, hinek jî ne herêmî ne ango herî kêm li çend devaran tê gotin. Lê zimanê ku di mamikan de hatiye bikaranîn piranî zimanê herêmî (devokî) ye. Ango bi awayekî zimanê devokî mohra xwe li mamikan daye. Mînak:

*Du xwêkê min henin*
*İlleh li hev dinêrin?*

(her du milên tifikê) Basa

*Bapîrê min jêlil (ji hêl) tê*
*Piştîkî histirî li piştê?*

(jijo) Şernex

*Du heb gomê me*
*Li ser kutkî ye?*

(çav û poz) Pasûr


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Êvarê di ezmên de dirnî ye*
*Siwê radibim ku Kolik*

5- Taybetiyeke din ya mamikan jî waryant (guharto) e. Wateya "waryant"ê guhertina li gor herêman e. Gotina mamikê, di nava demê de û di navbera herêman de diguhere. Ev guherîn (guhertin) carina bi lêzêdekirina gotinê, carina bi ketina gotinê, carina jî bi guherandina têgehan pêk tê. Dema ku em bi baldarî li mînakên jêr binêrin em ê van taybetmendiyan bibînin.

*Kumikê xezalê*
*Ger bû newalê?*

(teşî) Sûrgûcî

*Kumê xezalê*
*Gêr bû newalê?*

(botav-cureyeke giya ye) Ëlih

*Kofiya xezalê*
*Kilîlî bû çû devê newalê?*

(top) Pasûr

*Kofiya xezalê*
*Gêr bû newalê?*

(g... zarokan) Pasûr

*Kofiya xezalê*
*Totî newalê?*

(zîpik-teyrok) Qereyazî

*Kofiya xezalê*
*Hol bû newalê?*

(hîv-heyv) salnameya nçm'ê

*Kofiya xezalê*
*Gêr bû newalê?*

(sî) Pasûr


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Kofiya xezalê*
*Tûtiya newalê?*

(hîv-heyv) salnameya roj

6- Hinek mamik gotinên nexweş (çêr-dijûn-xeber) di hundirê xwe de dihewînin. Mînak:

*Mamkê mino*
*Diya te her sibe destikek k... dişû?*

(kevçik) Dihê

*Mamê te mam êlek*
*Dest û tilî çerm êlek*
*Daxdane q... çêlek?*

(beq) Basan


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

## TIŞTONEK-MAMIK (TÊDERXISTINOK-METELOK-MESELOK-ÇIK ÇIKO)

*Mamkê mino/*
*Tiştekî min heye/*
*Mamgî minî mamanî/*
*........................... çi ye?*

(Bersiv)

*Aspaşîn*
*Hemû kullehên serî şîn?*

(şixate-kîbrît) Qilaban

*Apê sincik*
*bazda quncik?*

(mişk)

*Awayê max û holê*
*Zaran re wek malê*
*Kursî û mase li balê*
*Cihê fêrbûna salê!*

(pol)

*Apê min ê rû kur kirî,*
*Bi şev û rojê darve kirî?*

(derî)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Apê minî ling dar*
*Çû ser dar,*
*Dar anî xwar?*

(tevşo)

*Mamgî minî mamanî*
*Aşê dêm, çi ye?*

(saet) Qilaban

*Atûrek (dürüm) du qûn?*

(lox-banger) Semsûr-Kolik

*Axûrekî min heye*
*Tijî gayê beşik e?*

(dev û diran) Semsûr-Kolik

*Alîkî reş e*
*Alîkî spî ye*
*Nava wê kun e?*

(kezeb-cîger)

*Ava banî*
*Di latê de danî?*

(şironek-mezrîb)

*Av dinyayê têr dike*
*Çi avê têr dike?*

(tîna êvarê)

*Aş aş*
*Çil feraş*
*Dido li pêş*
*Dido li paş?*

(guhanê çêlekê) Norşîn-Bedlîs


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Bazinê spî ye*
*Li bin devî ye?*

(pîvok) Basan

*Biharan bûk e,*
*Havînan sûk e;*
*Pehîzan pepûk e*

(dara fêkî) Botan

*Bazina elê*
*Avêt kelê?*

(roj-tav) Qerecdax

*Berelatek heye*
*Birek mih tê de ye*
*Seyekî sor devê wê de ye?*

(dev, diran, ziman) Hezex

*Bapîrê min jêlil (ji hêl) tê*
*Piştîkî histirî li piştê?*

(jîjo) Şernex

*Bazînê sitiyê*
*Xwe avêt deviyê?*

(mar) Şernex

*Belo rabî*
*Esker derbî?*

(bizin) Şernex

*Binî ax e,*
*Navê şax e,*
*Serî zêr e?*

(genim)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Bizina hinar*
*Bazda zinar*
*Sî û sê gulî anî xar?*

(dasa dara an jî jilet) Pasûr

*Bi roj radize li ser piştê*
*Êvarê radibe dora teştê?*

(rojî) Qereyazî

*Bi şev û roj diçe*
*Lê naweste?*

(av) Qereyazî

*Bi şev bi roj mezin dibe*
*Damarê wî heye, xwîna wî tune ye?*

(dara ku şîn dibe) Qereyazî

*Bi roj  bûk e*
*Bi şev pepûk e?*

(dolaba nivîna-cîhnivîn) Pasûr

*Bi roj xemilî*
*Bi şev kemilî?*

(mavling-cihnivîn) Farqîn

*Bi şev bela (belav) ye*
*Bi roj kela ye?*

(kulîn-cîhnivîn) Mêrdîn

*Bûk li sindoqê*
*Deng li zaboqê?*

(radyo) Pasûr


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Bûkek me heye*
*Xiftanê wê kesk e*
*Fîstanê wê sor e*
*Bişkovên wê reş e?*

(zebeş) Qerecdax

*Bazina xezalê*
*Gêr bû newalê?*

(mar) Wan-Miks

*Bê rih diçe*
*Rihan tîne?*

(şeh û sipih) Wan-Miks

*Bêbismillah ket ber dinana*
*Qêrîn kir erş û ezmana?*

(nan) Basan

*Bi pişt e û bê zik e,*
*Bi dest e, lê bê ling e.*
*Bi dev e bê didan e.*
*Bi çav e lê nabîne*

(meşk)

*Bi ro vedimire*
*Bi şev vêdikeve?*

(istêrek-stêrk) Semsûr-Kolik

*Bi şevê dibiriqê*
*Bi rojê nabiriqê?*

(lambe)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Bi şev xûya ye*
*Bi roj winda ye?*

(stêrk)Mêrdîn

*Bi şev xatûn e*
*Bi roj qewraş e?*

(sivnik-milkis)Hazro

*Bi banî ketim du gulên geş,*
*Bi banî ketim du marê reş,*
*Bi banî ketim meydana xweş,*
*Bi banî ketim ev zala hûta?*

(1.çav, 2.birî, 3.enî, 4.por)

*Bêcan û bêruh e*
*Wek mirov diaxive?*

(Televizyon)

*Binî şîn e,*
*Serî spî ye*
*Û kulav zêrîn e?*

(Nêrgiz)

*Bi pel û strîn e,*
*Li ber dilê bilbil şêrîn e?*

(Gul)

*Bûxçika çekê mekê,*
*Ji Xwedê pê ve kes nikare vekê?*

(jina bi hemil)

*Bi qirik e, bê ziman e*
*Bi dev e, bê diran e*
*Dilorîne, ne însan e?*

(bilûr)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Bin goşt e, ser mermer e*
*Li hemû dera xwedî mal e?*
(kûsî)

*Tiştekî min heye*
*Bi deha terim (derim) dudiya?*
(dûtina bizinê) semsûr-kolik

*Behra şîn e*
*Av tê nîne?*
(Kevz-kez-yosun)

*Bêrûh e*
*Rûha dibezîne?*
(gû) Cizîrê

*Bûço şîqin*
*Di hewşû kin?*
(muj) Konya

*Bîr çermînî*
*Av axînî*
*Dewl darînî?*
(kildank, kilçov û kilçov)

*Bêserî û bêling,*
*Di herike li bajar û gund?*
(çem)

*Bizina kejik*
*Li ser hejik?*
*(moza sor) Botan*

*Bûka mamosta*
*Ket desta*
*Ne da kesî ne berda?*
(qup û çêçik)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Bi piyê xwe diçe mala xelkê*
*Bi piyê xelkê diçe mala xwe?*
(mirî)

*Bêdest û bêling e*
*Lê avjeniyê dike?*
(masî)

*Ber jor dibe vala dibe*
*Ber jêr dibe tije dibe?*
(kum-kumik)

*Binî ax e,*
*Dorê ax e*
*Birayê mîr e*
*Dorê stirî û şax e?*
(hêjîr û sîsikên di nav de)

*Bizir tenê yek*
*Jê sadir bû keriyek?*
(kartol)

*Bi kabê xwe*
*Avê vedixwe?*
(kundir)

*Bi behr e*
*Du xet lê hene*
*Yek jê sor e*
*Yek jê zer e?*
(şemamok)

*Bêkinc e*
*Pîna li xwe dike?*
(sêla nên)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Bilbila rengî*
*Derdixe hezar dengî?*

(radyo)

*Bi pîrî ji diya xwe dibe?*

(pembû)

*Bêdev e*
*Lê sed diran e?*

(şeh)

*Baskê wî heye, çûk nîn e*
*Qiloçê (qoç) heye, Beran nîn e?*

(mêş)

*Bi roj razaye*
*Bi şev şîyar e?*

(şevşevok)

*Bîrek heye*
*Tê de du cure av heye?*

(hêk)

*Bizina reng hinar*
*Bazda çû zinar?*

(sihorî-sivorî)

*Bizina kal*
*Li ser kendal*
*Yah-yah dikime nayê xwar?*

(heyv)

*Bi destan dinivîsim*
*Bi çavan didim hev?*

(xwendin û nivîsandin)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Binî hesin e*
*Ser dar e*
*Nava wî goşt e?*
(hesp)

*Bi roj dibetilê*
*Bi şev dixemilê?*
(çira)

*Bi şev date*
*Bi roj hilte?*
(nivîn)

*Bêdev e, bêdiran e*
*Bêkinc e, tev eyar e*
*Li dawetê li dar e?*
(def)

*Bav ciwan e*
*Law extiyar e?*
(agir û dû)

*Bi mino*
*Û ne ji mino?*
(siya mirov)

*Bav şeş mehî*
*Law diçe bazarê?*
(xiyar)

*Bi şev bi roj dixebite mînanî bûk e*
*Ji eynikê rindtir e?*
(kutan-gêsin) Qereyazî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Ciya (diya) te çêdike*
*Bavê te tê re dike?*

(gore) Şernex

*Ciwan e lê serboz e*
*Her dem dora wî toz e?*

(Aşyan-aşvan) Botan

*Camiya kurtisandî*[1]
*Li ser xaniya reqisandî?*

(zîpik) Qereyazî

*Cêwî ne li kêlek in*
*Ne goşt in, lê nermik in*
*Dengan kom dikin*
*Ev çi ye, de fêm bikin!*

(guh)

*Cot dike ne ga ye,*
*xwarinê dixwe, birçî nabe?*

(traktor)

*Cîhana reş û tarî,*
*Tê de dijîn zehf zebanî?*

(Pest û Zilm)

*Canê wê goşt e*
*Kincê wê strî ye?*

(jûjî)

*Can, li bêcanê siwar bûn*
*Can û bêcan tev bêîmanê siwar bûn?*

(1. rêwî, 2. keştî, 3. av)

1 Qûsandî , por kurkirin


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Cot bira ne*
*Du diran e?*
(meqes)

*Çavspîko*
*Li nav devîko?*
(pîvikt-pîvok) Hezex

*Çar tajî*
*Çar kulav*
*Ji vir hetanî bexda?*
(berf) Qereyazî

*Çar bira berdin hev*
*Tucarî nagihin hev?*
(çirik-çirçirik-makîneya pembû) Dihê

*Çar pê ye, ne li ser rê ye*
*Bi bar e, ne dewar e?*
(malnivînk) Êlih

*Çar ningo bi rê ket*
*Ting û vingo bi dorê ket?*
(ker û mêş) Mêrdîn

*Çarê çêkê*
*Heştê mêkê?*
(dêlik) Qereyazî

*Çûme camiyê*
*Min derî vekir tijî ayetê kursiyê?*
(dev û diran) Qereyazî

*Çem û çem*
*Teşika ʿecem(fars)?*
(mar) Hazro


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Çem çeq e*
*Hezar weşî?*
(dûvê hesp) Norşîn-Bedlîs

*Çeqmeq e*
*Teq û req e*
*Heçî nizanibe ehmeq e?*
(çeqandina tiliyan) Hezex

*Çû tirne eyar heye*
*Çi pût (pirç) ne (tune)?*
(beq) Qilaban

*Çil derzî*
*Çil û çar derzî*
*Qula derziyê de bezî?*
(ta) Wan-Şax

*Çil mêvanê şûştî*
*Li ba hev rûniştî?*
(neftik-kibrît) Wan-Şax

*Çindik çindik,*
*Bazda quncik,*
*Bê dil û bê gurçik?*
(Kêç) Pasûr

*Çindik çindik*
*Bazda çû quncik?*
(mişk)

*Çi qas bixwe*
*Têr nabe?*
(agir)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Çar pê ye*
*Li serê xani digere ?*
(text)

*Çûme çolê çolbeyarkî,*
*Heft dûv li pey berankî?*
(Lema Zebeşan)

*Çi xaniyek damiştî,*
*Bilbil tê de rûniştî?*
(dev û ziman)

*Çav tune lê dimeşe*
*Ling tune lê şop dihêle?*
(derzî)

*Ço kero,*
*Hevsar zero,*
*Li dû min wero?*
(pangor-banger)

*Şerbikê pîrê,*
*Çû binê bîrê?*
(dewl)

*Çûme êş,*
*Ecêbek hate pêş,*
*Bi çar lingan bû*
*Ji xeynî yê pêş?*
(kêvjal)

*Çiyayê bêkevir,*
*Derya ya bê av,*
*Daristana bê dar,*
*Bajarê bê mirov?*
(nexşe)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Çalika qutik tije av?*

(çira)

*Çil çît in*
*Çil ber çît in*
*Çil ode ne*
*Çil zêde ne?*

(Qur’an) Basan

*Çil çîk in,*
*Çil berçîk in*
*Çil ode ne*
*Çil kilîle ne. Çî ye?*

(pîvaz) Gundikê Melî Şernex

*Çînî çînî hezar çînî*
*Meriv dixwînim hilçinî?*

(kitêw-pirtûk)

*Çermê gayî*
*Li ser avê nayî*
*Ne nimhayî?*

(sêl-sêlik) Qilaban

*Çavê ga li kadînê, çi ye?*

(hîv) Pasûr

*Çil heb hûrî*
*Di binê melezkî de?*

(hinar) Pasûr

*Çûm nava delê*
*Ez geriyam negeriyam*
*Min şivekî rast nedît?*

(mar) Farqîn


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Çûm nava dehlekî*
*Hat xişîna marekî?*

(tiving) Pasûr

*Çeqmeq e*
*Leq û peq e*
*Heçî ku destê xwe bidê wê*
*ehmeq e*

(dûpiştik) Dihê

*Çentê mistî*[1]
*Hilawistî?*

(ûşûyê-weşî- tirî) Dihê

*Çiyayê me reng û reng e*
*Dayê rabe dereng e?*

(banga sibehî) Basan

*Çûm newalekî*
*Hat nal nala birîndarekî?*

(bivir) Basan

*Mamkê mino*
*Çûk firî sîtil li mila?*

(deravî, Beravî) Dihê

*Çûm û çûm du rêz mirarî ye*
*Çûm û çûm du gulê geş e*
*Çûm û çûm çirayê geş e*
*Çûm û çûm dahlekî reş e?*

(1: diran, 2. difin, 3. çav, 4. por)

---

1 Miştî, tijî


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Çar çarox*
*Bîst û çar bendeçarox?*

(nal û bizmar)

*Çûm şer diyarekî*
*Min dest pê kir karekî*
*Beqek di devê marekî?*

(melhêb)

*Çermê mirî*
*Dev vekirî?*

(meşk)

*Çîz û vîz Evdilezîz*
*Hate malê bû qîz?*

(name)

*Çûm odekî çil tax*
*Çil miştax*
*Çil ortax?*

(hinar)

*Çîz dikim, diçikînim*
*Li dîwêr dialiqînim?*

(derzîdank)

*Çar bira nin*
*Her çar jî di xetekî de cot dikin?*

(şîşikên goreyê)

*Çav zero,*
*Simbêl belo*
*Li ser dîwarê hembero?*

(kund)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Çêlek li hundir dize*
*Golik li banî direqise?*

(agir û dû)

*Çûme ser çiyayekî*
*Pey min dikeve qulekî?*

(pêlav)

*Çira çuyîne li ser conî*
*Ez dibînim tu nabînî?*

(çav) Qereyazî

*Dara ji nav daran*
*Jê tê dengê birîndaran?*

(gurbika mêşên hingivî) Qilaban

*Davê paniyê*
*Poz hildide?*

(lambe an jî tir û fis) Qereyazî

*Datînim digirî*
*Hildidim digirî*
*Çawa dikim digirî?*

(zengil) Qereyazî

*Didoyê nêkê*
*Çarê çêkê*
*Heştê zeynetirekê*
*Kîjanî ji xwe re hiltînî?*

(gihanê pez, çêlek û dêlikê) Norşîn-Bedlîs

*Darîno*
*Guh belîno*
*Guh belîno bi rê ket*
*Pê pehno bi pey ket?*

(cemdan, ker û mirov) Hazro


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Dest dêxim qunê*
*Dev ji hev vedibê?*

(meqes) Dihê

*Dargê du ta*
*Te li xwe kuta?*

(pantor-şal) Qilaban

*Dîzika daniya*
*Li ser xaniya?*

(mirîşka kurk-qup) Qereyazî

*Diya te di nava gund de diçe*
*Çil boxe li pê ne?*

(guliyê porê) Qereyazî

*Du bira bi hev re*
*Tîr diavêne avê?*

(guhanê pez) Norşîn-Bedlîs

*Dikutim bizmarekî*
*Deng diçe hezarekî?*

(tifing) wan-Miks

*Diçim naçim dirêj e*
*Dişûm naşûm qirêj e?*

(rê) Wan-Miks

*Mamkê minê mamanî*
*Du stûn gulte*
*Dan ber şaş û perên bavê te*
*Her bî cîzvîza diya te?*

(aş) Qilaban


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Dixwe û dixwe narî?*

(meqes) Mêrdîn

*Derî navika da(diya) te*
*Gû di nav rihêt bavî te?*

(duhnê meşkê-nivîşik) Qilaban

*Diya te dibê: çirr*
*Bavê te dibê: zirr?*

(derî) Qilaban

*Delala malê*
*Û xisara salê?*

(beran)

*Dernakeve ji mal e*
*Hem ciwan e hem kal e*
*Geh şûr e geh mertal e*
*Hem neyar e, hem ji heval e*
*Geh şîrîn e geh tahl e?*

(ziman)

*Deng tê ji ezmanan,*
*Qîjîn dikeve newalan?*

(Birûsk)

*Dengbêjekî deng zelal e,*
*Ji qewmê xwe re neyar e?*

(Kew)

*Dirêj e ne mar e,*
*Kej û hît e ne kar e,*
*Serî hişk e ji dar e?*

(werîs û heçî) Botan


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Diya te her sibeh*
*Quneki tazî deynê ser milê xwe?*

(cêrik) Dihê

*Di avê de pêlewan e,*
*Li bejayê bê can e?*

(masî)

*Deve merixî*
*zincîr li dorê çerixî?*

(Deve: Kundir; Zincîr: Lem)

*Dor dar*
*Qul hezar?*

(moxil-bêjîng)

*Dixwîne ne mela ye*
*Ne aşiq e, ne xwenda ye*
*Dijminê qewmê xwe ye?*

(kew)

*Dibezim dibezim*
*Lê nagihim?*

(av) Basan

*Diçim gav û gav*
*Ewê min dixist(dixwest?) nav?*

(xwendinahî) Basan

*Dixwîne fihêt (fedî) nake*
*Eşkere malê çênake?*

(kew) Basan


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Dikim nakim zûwa nake*
*Ez lê nenêrim feyde nake?*

(av) Basan

*Digerê war û war*
*Li ser cihê xwe dike hawar?*

(mar) Basan

*Diçim war û war*
*Ketim derdek evîndar?*

(dergûşa dadê) Basan

*Din li dinê ket*
*Piyana şamî li erdê ket?*

(top) Cizîrê

*Diçim diçim*
*Li pey min tê?*

(sêhik-sî) Basan

*Diçim nava dehlekî*
*Tê çêrîna marekî?*

(bilûr) Hazro

*Diçim nava dehlekî*
*Tev şivê rast in?*

(şeh) Hazro

*Diçim nava dehlê*
*Tev xwar(xwehr) in?*

(qiloçê bizinê) Hazro

*Dîkek li ser darê*
*Hêkek jî li wa serê*


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Milek darê av e*
*Milek giya ye*
*Hêk kî alî de bikeve naşiket?*

(dîk hêk nake) Cizîrê

*Dîzika mîra şkest*
*Deng li dinê ket?*

(birîsk-birûsk) Dihê

*Mamkê mino*
*Diya te her sibe destikek k.r dişû?*

(kevçik) Dihê

*Dara li nav dara*
*Xemilandî ji gihara?*

(tihok-taw) Pasûr

*Devê wê qasê devê te*
*Gûyê wê li devê bavê te?*

(dewkil-meşk) Pasûr

*Distar li ser distarê*
*Deng li erşê Xudanê?*

(ewr û esman) Pasûr

*Dîzika*[1] *daniya*
*Li serê baniya?*

(stêrk) Pasûr

*Du rêşiyên badayî,*
*Li bepal girêdayî?*

(Simbêl)

1 Cer, çomlek


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Du heb gomê me*
*Li ser kutkî ye?*
(çav û poz) Pasûr

*Dido li pêşiyê*
*Dido li paşiyê*
*Bê ling e*
*Dertê dikeve hewşê?*
(guhanê çêlekan) Qereyazî

*Du ning bi rê ket*
*Çar ning pê ket*
*Çîz û vîzo bi dorê ket?*
(çerçî, hestir, zarok) Qerecdax

*Du golên reş û hişîn,*
*Li ser bejna şan û şîn?*
(Çav)

*Du xwêhikê(xwîşk) min henin*
*İlleh (Her dem) li hev dinêrin?*
(her du milên tifikê) Basan

*Du qulikê roviya*
*Du çirê nebiya*
*Aşekî xirabe ber geriya?*
(1.poz, 2.çav, 3.dev) Qerecdax

*Du guniyê tehtê ve*
*Dilê dayikan pê ve?*
(çiçik-memik) Basan

*Du kaniyên tehtê ve*
*Rizqê dinê tê de?*
(çiçik)


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Du xwişk in*
*Ji hev bawer nakin?*

(çav)

*Du marên reş*
*Du gulên geş?*

(çav û birî)

*Du pencerên bêderî*
*Bi şev girtî, bi roj vekirî?*

(çav)

*Du heb sêvên gilover,*
*li ser sîngê sor û zer?*

(memik, bistan)

*Du rîsê giya*
*Li pişta çiya?*

(kezî) Farqîn

*Dêra Zaferan e*
*Nivîs hûr e wek Kur'an e*
*Yekî nizanibe ker û heywan e?*

(zêr) Qerecdax

*Fir dide baskê wê tune*
*Datîne lingê wê tune*
*Şîr dide gihanê wê tune?*

(kerengzer) Qereyazî

*Deve tev bêr (bar)*
*Narê êxûr?*

(kevçîk) Semsûr-Kolik


Ücretsiz PDF Kitap Arsivi - https://rantey.org

*Der tê diwara*
*Lê dixin bizmara*
*Dengê wê diçe erş û ela?*

(birûsk) Qereyazî

*Di dinyayê de*
*Çi şêrîn e*
*Çi bi bîhn e*
*Çi bi qûwet e?*

(1. evîn-eşq, 2. nanê tenûrê ê taze, 3. hesp) Qereyazî

*Dar e*
*Li ser darê hinar e,*
*Li ser hinarê kopal e,*
*Li ser kopêl rist e,*
*Liser ristê kulmist e?*

(teşî)

*Destekî çermîn e,*
*Bi(bê?) damar e,*
*Bê xwîn e?*

(lepik)

*Dara silîva*
*Sisê li sihê dido li tava?*

(mêj-nimêj) Dihê

*Darê hişkê gûz,*
*Dertîne dengê bi bandor û zîz?*

(bilûr)

*Darînî ye*
*Mûyînî ye*
*Hasinî ye?*

(mêzîn-şehîn û weqî)

*Dimeşe bêling e*
*Çerm heye, mû tune ye?*

(mar)

*Dotil e,*
*Ne satil e*
*Çar çembil e?*

(kûsî)

*Diçim û diçim du parçe sêv*
*Diçim û diçim du qulên rovî*
*Diçim û diçim du rêz morî*
*Diçim û diçim du çirayên nebî*
*Diçim û diçim du marên reş*
*Diçim û diçim meydanek xweş*
*Diçim û diçim dêla huta?*

(lim-poz-çav-bihr-enî-por) Farqîn

*Di rêzekê de keriyeke pez*
*Tim û tim dikin lez?*

(mûristan-gêrik)

*Dere şop nîne*
*Tê toz nîne?*

(masî)

*Dere (diçe) qula xwe ne mar e*
*Bi pûrt e ne kar e?*

(rûvî) Mêrdîn

*Serî ferş e*
*Binî goşt e?*

(tilî)

*Dide hev çeleng û xebatkar e*
*Lê ne parsek ne jî cotyar e?*

(mûristan)

*Dergûşa siltanî*
*Kes pê nizanî?*

(zikê dê) Mêrdîn

*Dar û du ben*
*Heçî bikeviyê bû reben?*

(qefesa kew)

*Tiştekî min heye*
*Dikeve avê şil nabe?*

(sî)

*Di zeviyê de nasekine*
*Li bazarê nayê firotin*
*Ji şekir şêrîntir e?*

(xew)

*Di dev re dixwe*
*Di dev re derdixe?*

(tenûr)

*Dirêj enirî*
*Fişqî jê firî?*

(tiving) Botan

*Tiştekî min heye*
*Dixwe lê narî?*

(qirnî-kirnî)

*Diçîze, namîze*
*Ji min derket, kete te?*

(deng)

*Diçize*
*Lê nabihîze?*

(hêk)

*Dîwana tarî*
*Û ronî?*

(şev û roj)

*Darek*
*Duwazdeh şax û sî çêlik?*

(sal, meh, roj)

*Digere digere rêç tune*
*Difetile difetile toz û dûman tune?*

(saet)

*Deştekî çermî*
*Li binî du çirên ronî?*

(enî û çav)

*Dirêj e dirêj*
*Heya mala derwêş?*

(hûr û rûvî)

*Di agir de naşewite*
*Di avê de şîn nabe?*

(roj-tav)

*Der û hundur agir e*
*Yek zûwa yek şil e?*

(dinya)

*Dixwe, naxwe*
*Têr nabe?*

(dev)

*Desteke reş tije çirîsk*
*Ne agir lê heye ne xwelî?*

(ezman û stêrk)

*Delala dê ye*
*Li ber sêlê ye?*

(keç-qîz)

*Tiştekî min heye*
*Dox (dûv) dirêj e, naçe tûr?*

(miqilk-meqilk)

*Di jêr de dixwe*
*Di jor de diavêje?*

(tiving)

*Difire bêçeng e*
*Geza dide bê diran e?*

(keremper-kerengper-kelemper)

*Mamikên min û maman e*
*Deng tê denganek tê*
*Diçe ser serê dara û tê*
*Diçe binê behran û tê?*

(mêşa hingiv)

*Diavêjim tencerê(quçxanê) naşike*
*Diavêjim pencerê dişike?*

(kutilk) Farqîn

*Dibêjim were were, nayê*
*Dibêjim newe, tê?*

(lêv)

*Dirêj e spîndar e*
*Di ser de rist e*
*Di bin de mist e?*

(teşî)

*Dersoka mermerî*
*Tijî sêvêd heyderî?*

(esman û stêrk)

*Dîkek e dîkvanek e*
*Çar mî ne, beranek e?*

(dest û tilî)

*Dengê ji devê te tê çi ye?*

(axaftin-şûrkirin) Kolik-Semsûr

*Erebê dohn(rûn) dayî*
*Xwe li diya te dayî?*

(meşk) Basan

*Ez çûm êş e (aş)*
*Kelaşek li êş e*
*Heft linga dide pêş e?*

(kêvjal) Botan

*Elo di gelî de*
*Fotir di serî de*

(karî-kidadik-karûk) Arçak-Wan

*Ez çûm nêv garankê*
*Çêleka kiçik heft çerm e?*

(pîvaz) Cizîrê

*Ez çûm aşkî, aş dêm e*
*Min got: aşo tu çi aş î*
*Aşî got: ez hesebdarê dinê me?*

(demjimêr) Cizîrê

*Em çûyîn bêriyê*
*Ma anî tejî têrê?*

(şîr) Cizîrê

*Em çûyin ber pezî*
*Me anî tiştek zêdeyî?*

(berx) Cizîrê

*Ez çûm serê milê*
*Tiştek bi min re diştexilê?*

(name) Basan

*Ez dinêrim amê te*
*Nayê dengê mamê te?*

(dîkê serjêkirî) Basan

*Ez hatim min tu xwestî*
*Derketim bi dilek şkestî?*

(cenaze) Basan

*Ez çûm nizarkî*
*Hat nalnala birîndarkî?*

(mêşa hingiv) Cizîrê

*Ez dihilînim wek gakî ye*
*Ez dideynim wek çiyakî ye?*

(kon) Cizîrê

*Mamkê mino mamanî*
*Ez li hire deynime*
*Ew li wê dera he hişîn dibe?*

(xiyar) Cizîrê

*Ez çûm ser zinarekî*
*Tiliya min ket qulekî*
*Dengê min çû hezarekî*

(tiving)

*Ez çûm dîwara*
*Ningê min ket eyara?*

(gîzme-cezme-çîzme) Qereyazî

*Ew di hundirê malê de*
*Mal di hundirê wê de?*

(eyne) Pasûr

*Ez çûm serê milekê*
*Hemü bûkê salekê?*

(rêwas-riwês) Qilaban

*Ez hespê xwe dibim avê*
*Hesp avê venaxwê*
*Kapê wî avê vedixwe?*

(lambeya xazê) Wan-Şax

*Ez çûm Gite*
*Min anî stûna du gulte*
*Min êxist nêvrana bavê te*
*Bî çirçira diya te?*

(meqes) Cizîrê

*Ez diçim ew diçe*
*Ez disekinim ew diçe?*
(zeman-dem) Qilaban

*Eywana şûştî mûştî*
*Bûkek tê de rûniştî?*
(lambe) Pasûr

*Ez girêdidim baz dide*
*Ez vedikim nare?*
(sol-çarox) Mêrdîn-Stewrê

*Ew diçe hundur,*
*Gewde dimîne li derve dûr?*
(kevçî)

*Ez çûm ser ban(e)kî*
*Lê dinêrim hemû bûkê sal(e)kî?*
(kulîlkên hinarê) Dihê

*Ezmanê darîn e,*
*Berfê dibarîne?*
(moxil)

*Eyar heye, mû tune,*
*Xwe digivêşe g.. tune?*
(beq)

*Ez ji tehtê de diavêjim naşikê*
*Ez diavêjim kulekukê de dişikê?*
(kizwan-kewzan) Gundikê Melî

*Ewrekî piçûk*
*Dibarîne berfa pûk?*
(moxil)

*Ez hatim ji ha ve*
*Min ecêbek dît bi çav e*
*Sîtilek li ser e, agir av e?*

(aş)

*Ez xwedî dikim*
*Ew dixemilîne?*

(çîçek)

*Ez miyê naxwim*
*Berxê dixwîm?*

(goz)

*Ez radizim*
*Ew ranazê?*

(dil)

*Ez derketim dîwarkî*
*Min kutiya bizmarkî*
*Deng çû hezarkî?*

(birûsk- ewr) Qereyazî

*Eskerê te li ser e*
*Bajarê te li ser e*
*Û aliyek şol, aliyek berî ye?*

(erd)

*Ew ji malê derdikeve*
*Mal jî ji wê derdikeve?*

(hêk)

*Eva deva hanê nakeve hundir*
*Serê wê jêke bila bikeve hundir?*

(sîwan-şemsiye) Qereyazî

*Êvarê di ezmên de dirnî ye*
*Siwê radibim ku tune ye?*
(stêrek) Semsûr-Kolik

*Êr(ar) berdî kadînê, ka dişewite*
*Kadîn naşewite?*
(qelûn) Semsûr-Kolik

*Feqê me xwe boyax dide*
*Gava vedibe spî dibe?*
(pirteqal) Basan

*Mamkê minê mamanî*
*Ferxî sax mak mirî?*
(mazî) Şernex

*Fetla giya*
*Li pişta çiya?*
(keziya qîza) Pasûr

*Fêkiyên wê xelk dibe*
*Pelên wê ba dibe?*
(dara fêkî)

*Firt fiyo*
*Li nav deriyo?*
(qîvar-kakbîrik-karok)

*Fincan dor bi deq*
*Heya Şam û şerq?*
(roj û heyv)

*Gava têr dixwe şa dibe*
*Mû dest didiyê radibe?*
(erebe-seyare) Basan

*Gava min danî ava kir*
*Gava min rakir xirab kir?*
(mehfûr-xalî) Basan

*Gava mû dibîne diherike*
*Gava mû nebîne dihetike?*
(çav) Basan

*Gava min dît, min ava kir*
*Pişt da min, xwe winda kir?*
(ronahî) Basan

*Gava dixwaze heviyê*
*Gava naxwaze dikeve bin deviyê?*
(beru-berû) Basan

*Gava digerê mû*[1] *dibêje yê dinyayê hew bikê*
*Ji bo parîkî xwe diavêjê şewkê?*
(masî) Basan

*Gayê zer li kû de were mexel*
*Salekî giya tê de heşîn nabe?*
(agir) Basan

*Gayê kejo*
*Di hewa re diajo?*
(teyare-balefir)-Wan-Miks

*Gayê beş,*
*Dendik reş,*
*Tam xweş,*
*Tê hûrkirin beş bi beş?*
(zebeş)

1 Mû: Di herêma botanê tê bikaranîn. Bi wateya “mirov” an jî cînavka “em” tê bikaranîn.

*Gava avê vedixwe*
*Kab diwerime?*

(qeysî)

*Gayê sorî serberdayî*
*Di gelî de berdayî?*

(ziman)

*Ga mexel dibe*
*Gayê dorê zer dibe?*

(zilfet: Xwarinek)

*Ga dadikim*
*Dûv jê dikim?*

(mehûj, mewîj) Dihê

*Gayê sor*
*Bin erdê de dike or or?*

(silk, silq) Dihê

*Gedekî min heye*
*Her sibe destê min dişû?*

(misîn) Mêrdîn

*Guhê mişk*
*Tijî rişk?*

(hêjir) Qilaban

*Guhê wê badidim*
*Zimanê wê der tê?*

(fitîla lambeyê) Qereyazî

*Goma bavê min li ser stûnekî?*

(karûk-kidadik-feqîroşk) Pasûr

*Giya dixwe ne golik e*
*Hêk dike ne tûtik e?*

(kûsî) Pasûr

*Golikê min heye*
*Dibim ser avê, av venaxwe*
*Kapikê wî vedixwe?*

(lemê kundir) Pasûr

*Golika sor*
*Çêleka reş dibalize (dialîsê)?*

(agir û beroş) Farqîn

*Golika Hekariya*
*Ket nav zadê Berwariya*
*Golik bêhestî*
*Genim bêbistî?*

(golik: spêh; genim: por, gevî) Dihê

*Gayê dilo*
*heftê çilo*

(pîvaz)

*Guloka mû,*
*li çiyê werbû?*

(mij)

*Gurza dara*
*Li wan nizara?*

(dûvê mehînê) Basan

*Gloka mû bi havodo?*

(xortim) Konya

*Gayê zexel*
*Li pêşiya malan li mexel?*

(kundir)

*Goka min a sor,*
*Tê de henin heft çermên spî*
*Dor bi dor?*

(pîvaz)

*Girêdidim diçe*
*Vedikim naçe?*

(pêlav) Dihê

*Goleke şîn e,*
*Tije çirayên rengîn e?*

(derya)

*Gur e,*
*Mirov dikare bigre?*

(wêneyê gur)

*Gulover e ne gok e*
*Serî sor e ne sêv e*
*Hundirê wê spî ye ne penêr e*
*Teriya wî heye ne mişk e?*

(tivir)

*Goma bavê te tijî pez e*
*Stûna rast tê de dirêj e?*

(moristank-kunmêwî) Qereyazî

*Girêka kofiyan*
*Mêrê horiyan?*

(spî)

*Guloka mû*
*Li serê diyaran belav bû?*
(hesp û zengû)

*Guleka dezî*
*Bi diyar ve bezî?*
(kewsûsik)

*Tiştekî min heye*
*Gûyê wê dermanê nexweşan e?*
(mêşa hingiv)

*Girêka bizmaran e*
*Li pişta malan e*
*Ji bo car û baran e?*
(hinar)

*Guhbelo bi rê ket*
*Gulovero bi ser ket*
*Xeftanzerê bi pey ket?*
(1. ker, 2. barê tirî, 3. moz)

*Giloka reş*
*Avêt pişta heft çiya?*
(şev)

*Girek di pêş de*
*Du qul tê de?*
(poz)

*Goştê wê heram e*
*Şîrê wê helal e?*
(mêşa hingiv)

*Gurî ket nav firaqê*
*Min berdayê bi şîrmaqê?*
(sabûn)

*Gir dixwe*
*Hûr diavêje?*
(patos)

*Gulek derketiye ji qudretê*
*Hem li dinê kêrî me tê hem jî axiretê?*
(pembû)

*Hatim hêt û hêt*
*Min lê nêrî li min bî pêt?*
(çiya) Basan

*Hiltîto miltîto*
*Şêx Silêmanokê dûv rûto?*
(Majmajînatik-marmarîjatik-marmarîşik) Botan

*Hewa re difire*
*Perê wê tune*
*Dimîne (mîna-weke) şekir e*
*Tama wê tune?*
(berf) Basan

*Hem gelgel e*
*Hem helhel e*
*Hem jî qewet e*
*Na werger e?*
(hirç) Cizîrê

*Hem ew avis e*
*Hem jî ca(h)niyê di zikê wê de avis e?*
(qeysî-mişmişk) Qereyazî

*Ha ha dikim*
*Tip tip dikim*
*Sê hezaran tevilhev dikim?*
(mêwî-morî) Wan-Şax

*Heft apê min li deştê*
*Her yek sêlek li ser piştê?*
(şewqa heft gûşe) Qereyazî

*Hilistan milistan*
*Keça mîrê gulistan*
*Ne memike ne pizdan?*
(mêkew-sepet) Colemêrg

*Hilhil rabû*
*Qijik li dorê şabû?*
(tenûr) Qereyazî

*Hesenê meman*
*Pez bir çeman*
*Sibê rabû*
*Yek jê neman?*
(stêrk) Qilaban

*Heftê heştê gêzekê*
*Çarê çermê çêlekê*
*Dido belê kutekê?*
(çîçîk-guhan) Pasûr

*Hemzeko*
*Pişt venako?*
(sivnik) Êlih

*Heft sala di bin erdê de*
*Û heft salên din di avê de bimîne tiştek pê naye?*
(zêr) Qereyazî

*Heft zift*
*Heft zir zift*
*Heft degene*
*Û heft megene?*

(kûtan-gêsîn) Qereyazî

*Heft tas di taseke de, çi ye?*

(pîvaz)

*Heft belendîrê tek tekê*
*Ji vir heya mekkê*
*Guhanê xwe dike û nazê?*

(qîz) Dêrîk

*Hildidim digirî,*
*Datînim aşt(haş) dibe?*

(Zengil)

*Her roj diçe dibistanê,*
*Lê tiştek nizane?*

(çente)

*Helheliko melmeliko*
*Simbêl tûjo guh beliko?*

(mişk)

*Helhela simbêl bela*
*Li ser taq û du kela?*

(pisîng)

*Helheloko, melmeloko*
*Terîsorko, guhbelko?*

(kîroşk)

*Hêşin e*
*Kilîta wî hesin e?*

(zebeş)

*Hespê boz*
*Meydanê dike toz?*

(mehtik-dergûş) Qilaban

*Hespê boz*
*Kir toz?*

(aş) Cizîrê

*Hespê boz*
*Afirê quloz*
*Pêbendê lê*
*Çiftan diavê*
*Sor dixwe, spî diavê?*

(aş)

*Hespê boz e*
*Rişme li poz e?*

(derzî û ta)

*Hespê qeleng*
*Û du ling?*

(mehdik-derguş) Qilaban

*Hilindir milindir*
*kur ji bavê bilintir?*

(ker û hêstir an jî agir û dûman) Pasûr

*Hilindir milindir*
*Kur ji bavê bilintir?*

(rêwas) Wan-Miks

*Hilindir milindir*
*Kur ji bavê bilintir?*

(dire-garis) Dihê

*Hîva li kadînê?*

(çavê ga) Pasûr

*Hê dikim*
*Boçê ber de jê dikim?*

(mewîj) Qerecdax

*Tiştekê min heye*
*Heya hundirê wê tijê goşt nekim naçe?*

(pêlav) Farqîn

*Heft qet e*
*Heft boqat e*
*Heft ode ye*
*Heft mizgeft e?*

(kelem) Qereyazî

*Him rast e*
*Him derew e*
*Him ferz e*
*Him sinet e?*

(şeytan pêkenî-cinabetî) Semsûr-Kolik

*Hespa şê*
*Reviya gomê?*

(kêç) Qerecdax

*Hespa çê*
*Bazda hewşê?*

(şironek, şirik)

*Hespê şê*
*Zincîr li pê?*
(sol)

*Hespê şê*
*Zincîr li pê?*
(zebeş)

*Hespê şevê*
*Bazda hewşê?*
(kêç) Qereyazî

*Hespeke çê ye*
*Qeyd û zincîr li pê ye*
*Hin jî şervanekî çê ye?*
(zebeş)

*Hêlo mêlo*
*Simbêl belo*
*Mîna kala*
*Xwe da pala*
*Şirqîn ketê*
*çû ezmana?*
(şilî-barîn) Qereyazî

*Tiştek heye*
*Her tişt tê re derbas dibe?*
(pênûs) Qereyazî

*Hum Humme*
*diwar summe?*
(dû û berxweliya sobe)

*Hinî minî*
*Li binê gûnî?*
(hêlîn) Wan-Şax

*Hingî tiliyeke ye*
*Yep xaniyeke ye?*

(çira) Wan-Miks

*Hêstira xiro*
*Banê giro?*

(pir) Cizîrê

*Her sihar diya te*
*Pînekî dibe q.na xwe?*

(nan û sêl) Cizîrê

*Mamgê mino mamanî*
*Hêlik reş û mêrganî?*

(k... kerê) Cizîrê

*Heba noka bi derzî,*
*Mar ji ber dibezî?*

(jûjî)

*Her her dîwar*
*Berber dîwar,*
*Xanim yek e,*
*Carî hezar?*

(Hîv û Stêrk)

*Heft qul û qultînik li ser?*

(serî)

*Haniya maniya*
*Ferşê di devê kaniya*
*Rê nade karwaniya?*

(cemed) Norşîn-Bedlîs

*Himber sima gakê*
*Hinek bajarkê?*

(kunmêvî) Cizîrê

*Heft tir kir*
*Hêjî difna wê xwar?*

(nok) Cizîrê

*Himber tilîkê*
*Tejî mezelkê?*

(çira) Cizîrê

*Hezar û hef sed mirov*
*Nêva nivînekê de ne?*

(hezar û hef sed e) Cizîrê

*Hilkutî milkutî*
*Şêx Zeyneba dûv rûtî?*

(mişk) Dihê

*Hilûse wey ava pêlê*
*Gava mû radihêjiyê jê tê dengê têlê?*

(saz) Basan

*Has hasincî*
*Paşayek rabû bi dozdeh cindî?*

(qup û çûçik)

*Hevsar zer e*
*Li dû min were*
*Ne ker e*
*Ne manker e?*

(teşî)

*Her gemo,*
*Mer gemo*
*Bi şev û roj li ber çemo?*

(sîtil)

*Her sal dirêj dibe*
*Û salê carekî xwe dixemilîne?*

(dar)

*Hesp diçe*
*Zîn nameşe?*

(av û pir)

*Hêdî hêdî mezin dibe*
*Hêdî hêdî biçûk dibe?*

(hîv)

*Hundur goşt e*
*Derve hestî ye?*

(kûsî)

*Heta êvarê axê li serê xwe dike*
*Lê dîsa jî ji berê paqijtir e?*

(gêsin)

*Hêsin û bizin*
*Quretiya mezin*
*Bi hevre dibezin?*

(îskapet-qundire-pêlav) Norşîn-Bedlîs

*Hilerim bilerim*
*Şeş pî û du ser im?*

(mêzîn)

*Hûno mûno*
*Du qûno?*

(gûndor-banger) Mêrdîn

*Heft deriyê wê heye*
*Û gelek azamet e?*

(serî)

*Heta ku nemire*
*Pişta xwe venake?*

(manûse)

*Her her dîwar*
*Mermer dîwar*
*Li her odeke yeke kubar?*

(lambe)

*Helhele li ba bûn*
*Reşhêle siwar bûn*
*Malî tev pê şa bûn?*

(beroşa xwarinê)

*Hewşika tengik*
*Tijî eskerê kinik?*

(niftik û derbikên wê)

*Hesin li ser hesin*
*Çi fîncana qûn mezin?*

(bîstan)

*Hêl ve tê*
*Kendêl ve tê*
*Porsorê nermê ve tê?*

(tîrêja rojê)

*Helîna şimşedarî*
*Ne li berrojê ne li nizarî?*

(masî)

*Hînî mînî*
*Li binî gonî*
*Ez dibînim*
*Lê tu nabînî?*

(çav)

*Hepino*
*Çar çepino*
*Radikî piya*
*Weke çiya?*

(kon)

*Hindik hindik*
*Dihdika hezar dendik?*

(hinar)

*Hûr hûr barî*
*Hey hey barî*
*Deşt û banî*
*Girt û danî?*

(berf)

*Herku mirov jê dibe*
*Mezin dibe?*

(kort-çalik)

*Impîlê darîn e,*
*ewil tahl, paşê şêrîn e?*

(hirmî)

*Îskender e*
*Sê cilê wî hene*
*Du spî yek zer e?*

(hêk) Wan-Miks

*Îp*
*Derî kîp?*

(gor) Qereyazî

*Ji min tenê re fihêt nake*
*Di civatê de deng nake?*

(radyo) Basan

*Ji çiyê tê kevirek*
*Çar pê û seriyek*

(kûsî) Wan

*Jinik li hundir e*
*Pora wê ji derve ye?*

(lazût-garis-direyê misir) Qereyazî

*Ji sibê hetanî êvarê di bin erdê re diçe*
*Lê dîsa jî eynikê zaftir dibiriqe?*

(gêsin) Qereyazî

*Ji hire û afirê*
*Çawa deynê welê difirê?*

(heyv) Basan

*Ji ha heta Handan*[1]
*Kulav radan?*

(berfende-aşîte-şapa berfê) Wan-Mîks

1 "Handan" navê gundekî Mîksê ye.

*Ji devê bilindtir e*
*Xwarina wê ji hingivî xweştir e*
*Şîrê wê ji jehrê nexweştir e*
*Tovê wê ji kuncî hûrtir e?*

(hêjîr) Cizîrê

*Ji gayî girtir e*
*Ji garisî hûrtir e?*

(hêjîr) Şernex

*Ji mûsil heya mûsil*
*Çel(çil) keçikên çav bi kil?*

(stêrk) Sûrgûcî

*Ji bexda heya bexda*
*Çel(çil) kulavê li hev rada(pêçandî)?*

(ewr) Sûrgûcî

*Ji hire û Balûka*[1]
*Bî tiv tiva nohka?*

(teyrok, zîpik) Basan

*Ji bexdayê heta Bilîsê*
*Keyf û xem li ser dirîsê?*

(telefon) Basan

*Ji hire û wê de*
*Sed mal û mezel*
*Di nav sima ga de?*

(kunmêwî) Dihê

*Ji hire û bexda*
*Şîtik(şûtik) li du ta?*

(rê) Qilaban

1 Navê gundekî yê Dihê ye.

*Ji hire û Memîra*[1]
*Hemî xiştê tîra?*

(sandek, kûjirek) Cizîrê

*Ji şekir şêrintir e,*
*ji hesin girantir e?*

(xew) Dihê

*Ji hingiv şêrîntir e*
*Tiştek jê ne xweştir e?*

(ziman)

*Ji hire û bexdayê*
*Kulav radayê?*

(berf) Dihê

*Ji hire û cem te*
*Çip li qûna te?*

(kêç) Dihê

*Ji darê ye*
*Ji berê ye*
*Ji biznê ye?*

(pembrûtik-banger) Qilaban

*Ji şikêrê ye*
*Ji têrê ye*
*Ji rêrê ye. Çî ye?*

(gêrûse) Gundikê Melî

*Ji vir û mekkê*
*Çil tiştîrê ber tekê*
*Bê nêrî gihanê xwe dike?*

(keç-qîz) Pasûr

1 Navê gundekî di navbera Dihê û Şernexê de ye.

*Ji ningê kewê kintir e*
*Ji pelê kur'anê pirtir e?*

(kavkelik-karî-kidadik) Qereyazî

*Ji goşt û hestî ye*
*Pênc şax û bi destî ye*
*Sed û yek huner lê ye*
*Li heywana pê ye*
*De bêjin ev çi ye?*

(tilî û dest)

*Ji tiştan ne tişt e,*
*Nikil weke xişt e,*
*Parsû li nava pişt e?*

(kermêş)

*Ji Kûr tê,*
*Ji dûr tê,*
*Gava vedireşe xwîn tê?*

(gule)

*Ji hire heta Mûsil*
*Hemî moriyên sinsil. Çî ye?*

(baran) Gundikê Melî

*Ji vir rîz,*
*Heta Xalabe tîz?*

(Mîrî-morî) Konya

*Ji wê da tê,*
*Yek li tile yek li milê,*
*Yek jî têda vile vilê?*

(jina biheml û du zarok pê re)

*Jineke kurt û mêrekî dirêj*
*Bi rê ve diçin şev û roj?*

(saet)

*Jora şil û miştî*
*Sih û du carî tê de rûniştî?*

(dev û diran)

*Ji min felitî*
*Li te xebitî?*

(kêç)

*Ji vir heta Helebê*
*Hema têlê qesebê?*

(tîrêjên rojê)

*Ji tirsa tajiyan*
*Radize li nav deviyan?*

(kîroşk)

*Ji ser ve helmet e*
*Ji bin ve helmet e*
*Ter didikê*
*Hişk dertê?*

(tenûr)

*Ji hesin û kevir e*
*Dixwe naxwe têr nabe û naşêkire?*

(aş)

*Ji tetik teniktir e*
*Ji kêran zeximtir e?*

(dewkil-meşk)

*Ji cihê xwe tevnagere*
*Piştî ketinê tevdigere?*
(pel)

*Ji dûr ve pir xuya ye*
*Ji nêzve nexwiyaye?*
(mîj)

*Ji dûr ve wek dar e*
*Ji nêz ve wek hungiv e?*
(hirmê)

*Ji jehrê tehltir*
*Ji şekir xweştir*
*Ji sêvê biçûktir*
*Ji devê girtir?*
(gûz)

*Ji vir heya Êrevanê*
*Weke kulavekê sûviya?*
(ewr)

*Ji çûkê biçûktir e*
*Ji minarê bilintir e*
*Ji derziyê ziravtir e?*
(giloka ta)

*Kalo tê ji deştê*
*Tefala dirî li piştê?*
(rih an jî jûjî) Pasûr

*Keçka heft kezî*
*Kaşka ve bezî*
*Kir hewar û gazî?*
(sûsik) Botan

*Keçeke min heye*
*Tirba xwe bi destê xwe dikole?*
(dilop) Hezex

*Kurtan e*
*Heçî nezan heywan e?*
(pir) Qilaban

*Ker zirî*
*Pişkul firî?*
(tifenk û gule) Colemêrg

*Ker bi barê xwe diçe*
*Lê dûv naçe?*
(kevçî) Wan-Miks

*Kerê bi bar*
*Çû qulika zinar?*
(kevçî) Hazro

*Kofiya xezalê*
*Kilîlî bû, çû devê newalê?*
(top) Pasûr

*Kofiya xezalê*
*Tûtiya newalê?*
(hîv)

*Kofiya xezalê*
*Gêr bû newalê?*
(gûyê zarokan) Pasûr

*Kofiya xezalê*
*Dol bû newalê?*
(gijlok-teyrok-zîpik) Wan-Şax

*Kumikê xezalê*
*Ger bû newalê?*

(teşî) Sûrgûcî

*Kumê xezalê*
*Gêrbû newalê?*

(botav) Êlih

*Kevir e ne kevir e*
*Çar pê ye ne dewar e*
*Hêk dike ne tûtik e?*

(kûsî) Pasûr

*Kalê li ser lingkî*
*Dike xizmeta gundkî?*

(derî) Pasûr

*Kalê li ser lingekî*
*Ho dike garana gundekî?*

(mêrkût û dan) Arçak-Wan

*Kalê rû bi dar de çi ye?*

(derî) Qereyazî

*Koka wê di erdê de ye*
*Nava wê di dewar de ye*
*Serê wê di mirov de ye?*

(genim) Farqîn

*Koka xwe ber jor e*
*Guliyê xwe ber jêr e*
*Li vê dinyayê çi ye?*

(roj) Semsûr-Kolik

*Ku çi tişt (hey)e*
*Pêva (he)ye*
*Ev çi ye?*

(nav) Semsûr-Kolik

*Kerika kerajo*
*Kê te diajo?*

(erebeya ga) Qereyazî

*Kumê hûtik*
*Tije nûtik?*

(Hejîr) Farqîn

*Kêw kir xure xur*
*Rûyê xwe şa kir*
*Rabî ordîkî rakir?*

(mêhkew û kewikên wê) Basan

*Kir nekir min  yaz nekir*
*Min nêrî, min nas nekir ?*

(sihik-sî) Basan

*Kurê kerê*
*Çû ser bênderê*
*Kayê dixwe*
*Nadê kerê?*

(mirovê kund û tima) Dihê

*Mamkê mino*
*Kêçê spîndarek rakir?*

(kuncî) Dihê

*Mamkê mino*
*Kêçê kuçek(kevirek) kir?*

(binerdik) Dihê

*Kela rûdarde çi ye?*
(derî) Wan-Şax

*Mamkê mino*
*Kerê kerr*
*Çû afir?*
(mîrkut-mêhkut) Cizîrê

*Kalê pîr,*
*Li civata mîr?*
(Semawer)

*Kozika tarî û bi mar,*
*Bi dûpişk û cinawar?*
(gor, goristan)

*Kirina wî ferz e,*
*Birin û anîna wî sunnet e?*
(gustîl)

*Kewara agir*
*Hevîr dike nanê hazir?*
(tenûr)

*Kewa kejî*
*Li hewa re diajo?*
(sirsûm-meşk) Qereyazî

*Kaxiz e çîzevîz,*
*Çû bajarê evdilezîz,*
*Tîne kêfa xort û qîz?*
(name)

*Kundirê di latê de,*
*Tamên vêga dinyayê tê de?*
(pêsîra dê)

*Kumê dirêj,*
*Tije qirêj?*

(bacana reş)

*Kumê hezî*
*Tije derzî?*

(jûjî, jîjo)

*Kîsê sorik*
*Tije morik?*

(hinar)

*Keçika dukezî*
*Serbanan ve bezî?*

(banger-bangur) Gundikê Melî-Şernex

*Kaniya qinê qinê*
*Mîr û hekîm dest didinê?*

(bêfil-difin)

*Kap avê vedixwe*
*Golik diwerime?*

(zebeş)

*Kîsê kaba di dar de*
*Deqê min di nav de?*

(hîv û stêrk)

*Kon e*
*Bêstûn e?*

(kuvkarik-kidadik)

*Kurtanê wê heye, ker nîn e*
*Qiloçê(qoç) wê heye, ga nîn e?*

(şeytanok)

*Kaniya nizarî*
*Mîr û hakiman av jê vexwarî?*

(memik)

*Kidî kidî mistan e*
*Çil dergûş li destan e*
*Ne ber e ne bistan e?*

(mirîşk û çêlikên wê)

*Lawik bang dike diyê*
*Ez naçim xerîbiyê?*

(nexweşî) Basan

*Laliya  savarê*
*Ser çiqilê darê?*

(hejîr) Cizîrê

*Li devê dinê didim digire*
*Li devê dîzê didim nagire?*

(pere) Norşîn-Bedlîs

*Li hewa re diçe,*
*baskê wê tune*
*Mînanî şekir e,*
*tama wê tune?*

(berf) Qereyazî

*Mamkê mino*
*Li cihê xwe rûdine ranabe?*

(xanî) Basan

*Li kuç didim naşkê*
*Li avê didim dişkê?*

(kaxiz-pelkê cixarê) Dihê

*Li teht û zinaran werdikî namire*
*Avê lê dikî dimire?*

(pelê cixarê) Merdîn

*Li ser girekî sê rê terin (derin)?*

(dolap-donme dolap) Semsûr-Kolik

*Li malê pişta xwe dide dîharê(dîwar) seqîn*
*Li çolê dikê teqîn?*

(bivir) Qereyazî

*Lem lemo*
*Ber çemo*
*Ne diz dibe*
*Ne gur dixwe?*

(aş) Mêrdîn-Stewrê

*Li vê dinya*
*Qafikî de sê kanî dertên*
*Yekî şîrîn e*
*Yekî tal e*
*Yekî şor e?*

(rûyê meriv) Semsûr-Kolik

*Lemê lem da*
*Behrê kef da*
*Mar hat*
*Masî zerik di dev da?*

(çira) Pasûr

*Li (ji) sêlê reştir e*
*Li berfê spîtir e*
*Li êr(agir) sortir e?*

(legleg) Semsûr-Kolik

*Li ser destan dişemite.*
*Dikeve çav dişewite.*

(sabûn)

*Lastîkek nerm e*
*Radike çivê qelem e!*

(jêbir)

*Li maxa bi dîwarî*
*Çar çivê bi kêrî*
*Wekî derî*
*Roj jê dibarî*
*Têkdiçe tarî!*

(pencere)

*Li dibîstan e*
*Hîn cîwan e*
*Li bendan e*
*Divê bizane*
*Dew û dozan e!*

(xwendekar)

*Li dîwar e*
*Ne kewar e*
*Qor bi qor e*
*Wekî per e*
*Tişt li ser e*
*Kî nezane ew ker e!*

(tereg)

*Li çolê heşîn e*
*Li çarşiyê reş e*
*Li malê sor e?*

(çay) Qereyazî

*Li ser erdê naçe,*
*li ser golê diçe?*

(keştî)

*Li ser golê naçe,*
*li ser erdê diçe?*

(erebe-seyare)

*Li ser erdê naçe,*
*li ser berfê diçe?*

(tawik-qol)

*Li ser refikê*
*Ronî dide defikê?*

(çira)

*Li vî alî kaş,*
*Li wî alî kaş,*
*Di nav de heye*
*Topekî qumaş?*

(Ziman)

*Li hewa nîsk e*
*Li erdê gîsk e?*

(quling) Qereyazî

*Li Amedê şîr rijiya,*
*Bêhna wî hat vira?*

(têlefon)

*Li serê carekî*
*Kuta bizmarekî*
*Deng çû hezarekî?*

(gulle)

*Li ser û bin dîwar e*
*Di nav de sayê har e?*

(ziman û diran)

*Li vir xîşt*
*Li ardê din qûna xwe almoşt?*

(Şijing) Konya

*Li ro digare digare,*
*Li şev te davî xwe jev dike dadiste?*

(maros) konya

*Li mirov dikeve dibore*
*Xuya nake dizûre?*

(mar)

*Li wî alî ber*
*Li vî alî ber*
*Di navê de mîr Emer?*

(mîrkut)

*Li mam heye*
*Li xal tune*
*Li mal heye*
*Li bal tune?*

(tîpa “m”ya erebî)

*Li çiyê deng dide*
*Tê li malê pal dide?*

(bivir)

*Li vî alî mijang*
*Li wî alî mijang*
*Li navê morî û mircan?*

(çav)

*Li jor disekine*
*Mirov ji berf û baranê diparêze?*

(sîwan)

*Li sûkê yek e*
*Li malê gelek e?*

(hinar)

*Li gund bêdeng e*
*Li daristanê bi deng e?*

(bivir)

*Li kaş û kendalan ser tazî*
*Dike hewar û gazî?*

(kew)

*Li dinê tişta herî şirîn, çi ye?*

(ziman)

*Li vir keliya*
*Li Stenbolê fûriya?*

(name)

*Li hewa re wisa diçe mînanî tîr*
*Wisa spî ye mînanî şîr*
*Wisa reş e mînanî qîr?*

(qijik) Qereyazî

*Mamê te exmûr*
*Da kaşê dûr*
*Serî lê bî ûr?*

(mêwî-morî) Basan

*Mamikê mino*
*Ez ji serî dikim dirêj dibe*
*Ez ji rexê dikim pehn dibe?*

(coya avê) Botan

*Malek bêderî*
*Tijê serî?*

(kunmêwî) Merdîn

*Ho dibêm tevşo dibêm*
*Nav hildidim nabêjim?*

(tevşo) Mêrdîn

*Mamikê minê mamanî*
*Me bênderek hilanî*
*Genim ji kayê pi(r)tir anî*

(mêşa hingivî) Botan

*Mamê te mam êlek*
*Dest û tilî çerm êlek*
*Daxdane q.zê çêlek?*

(beq) Basan

*Melayê li ser birînê*
*Ji derd û kulan re dixwînê?*

(mêhkew-mêkew) Basan

*Minara sor e di bin erdê de çi ye?*

(gêzir-gêzer) Qereyazî

*Mînanî kala*
*Xwe pala?*

(karûk-kidadik) Qereyazî

*Mamkê mino*
*Mar e, ne mar e*
*Xurcik li milan e, ne etar e?*

(k... mirov) Cizîrê

*Mamkê mino*
*Mil li te ve?*

(mil) Cizîrê

*Mamkê mino*
*Sofiyê çav kildayî?*

(bilalîsik-kulîlka newrozê) Dihê

*Mamkê mino*
*Ka çû ma dan?*[1]

(ka diçe zad dimîne) Dihê

*Mamkê mino*
*Ker firî?*[2]

(kew difire) Dihê

*Mamkê mino*
*Reşîne*[3] *difire?*

(reşîle) Dihê

Mizgefta maliştî
Du feqe tê de rûniştî?

(gûz) Basan

Mirîşka dirûnê(rûdine)
Radibe hêk nakê?

(textik-kursî) Dihê

1 Ev cûreyê mamikan wek zûgotinokan e. Dema ku zû tê gotin bi awayê “kaç ma dan” tê bihîstin.

2 Ev cûreyê mamikan çewtiyeke mantiqî dipirse. Ji ber ku ‘ker’ nikare bifire, peyva herî nêzê vê peyvê ‘kew’ e. Û kew dikare bifire.

3 Reşîne” navê gundekî Dihê ye, “reşîle” jî navê çûkekî ye. Leyistina bi tîpekî ev mamik derxistiye holê. Li mînaka berî vê binêrin.

*Mamê bi lingekê*
*Diçe şerê gundikê?*

(mîrkut-mêkut-mêhkut) Gundikê Melî

*Mele bi şaşkî*
*Çil ga çûne aşkî?*

(diran)

*Me çandî wekî nokan*
*Şîn bûn wekî sêvelokan*
*Pê ve hatin wekî gûzelokan?*

(pembû)

*Marê mirî*
*Tirr kirî?*

(Tiving)

*Marê mirî,*
*Erd qul kirî?*

(Baran)

*Mûyê karan,*
*Li ser daran,*
*Di bin de disitirin*
*Bi hezaran?*

(kon)

*Mele ye, şaşik nîne,*
*Aqilmend e ruh tê nîne?*

(pênûs)

*Masî çiv da*
*Behrê kef da*
*Nal sekinî*
*Dil xeber da?*

(saet-demjimêr) Wan-Şax

*Min xwêhikî heyî*
*Illeh enirî?*

(nohk) Şernex

*Mirî sax derdikeve*
*Sax mirî derdikeve?*

(hêk) Şernex

*Mange sor*
*Şak ber jor?*

(meşk) Konya

*Mirîşka min çû kepirê*
*Zîrça xwe bû şekirê?*

(mêşa hingiv)

*Meri bulut*
*Deri kilît ?*

(mirî)

*Mîr hilgirtî ye dirî*

(strî)

*Mamkê minê mamanî*
*Çêlekoka zerik ji xwe re digere. Çî ye?*

(kulind-kundir) Gundikê Melî

*Masî nîne*
*Lê, tim deryayê de ye?*

(keştî)

*Min ji dûr ve dît kevirek*
*Çûm nêzik çar ling û seriyek?*

(kûsî)

*Mirî*
*Mirov li serî digrî?*
(kuncî)

*Mexel tê pez tune*
*Dimeşe şop tune?*
(lehî)

*Min ecêbek dît di rê de*
*Kê mak dîtiye di zikê bavê de?*
(pembo)

*Mêrgeşîn, mêrgeşîn*
*Du siwar tê de xuşîn*
*Yek hesp e, yek mehîn?*
(heyv û roj)

*Morî kişiya*
*Erd hejiya?*
(hatina payîzê)

*Mehîneka sipî*
*Reşikên wê şîn?*
(pîvaza ter)

*Neçandî li ser pişta nezayî*
*Nezayî li ser pişta nelepit*
*Nelepit li ser pişta netebit?*
*(neçandî: xwê,*
*nezayî: hêstir (qantir),*
*nelepit: pir,*
*netebit: av) Basan*

*Neydûkdar e*
*Pê xepar e?*
(dîk) Botan

*Nexweş e dikevê xazê*
*Biharan şêv ranazê?*

(kund) Basan

*Nerm e, germ e*
*Tayê wê veke*
*Deyne ber me?*

(kîpe-rovî tîjê) Hezex

*Ne pê ye ne pahnî ye*
*Li bin kevirê siltanî ye?*

(mar) Pasûr

*Neh mih*
*Deh Beran*
*Yazdeh şivan*
*Dozdeh kûçik*
*Eviya çend dike?*

(dozdeh heb) Pasûr

*Ne li erd e,*
*Ne li ezman e,*
*Hêlîna begrewan e*
*Mifte li destê insan e?*

(balefir-teyare) Pasûr

*Ne li erd e*
*Ne li ezman e*
*Li ser hêlîna begrewan e?*

(zaroka di zikê diya xwe de) Farqîn

*Ne dest e, lê wek hev e*
*Ne şe ye, wek melêv e*
*Pehn dibe bi erdê ve*
*Mirov dipîve gav e!*

(ling)

*Ne bi hest û gêjî*
*Bi pîvan û mêjî*
*Qelema radihêjî*
*Ji bo rast be dirêjî!*

(rastkêş)

*Ne dixwe ne radizê,*
*Ne bîn digre ranaweste,*
*Ew bê razan û west e*

(katjimêr, demjimêr, saet)

*Nexweşê li nav nivînê*
*Dibînê dermanê birînê?*

(nivîştî) Basan

*Newaleke kûr*
*Tijî genimê hûr?*

(asîman)

*Nav mîna navî tazî*
*Toponî mîna topono xîştiro?*

(terazî) Konya

*Ne derîyê wê heye*
*Ne jî pacê wê heye*
*Tê û diçe, ev çi ye?*

(tir)

*Ne kes dikare bixwe*
*Ne dikare bipîve?*

(agir)

*Ne bi ber ve ye*
*Ne bi pişt ve ye?*

(zebeş)

*Odeyek e*
*Çar feqe tê de ne*
*Bê derî ye?*

(gûz û kaklê wê) Dihê

*Oda Haris*
*Tejî garis?*

(hinar) Wan-Şax

*Odeyeke şûştî mûştî*
*Sî û sê siwar lê rûniştî?*

(dev û diran) Pasûr

*Odeyek şûştî mûştî*
*Axayek tê de rûniştî?*

(şûr)

*Odeyek şûştî mûştî*
*Cotek zilam tê de rûniştî?*

(dev û diran) Mêrdîn

*Orte(nav) esmer e*
*Dorê kevirê mermer e*
*Ava cihokê diçe ser e?*

(kelem) Qereyazî

*Para li nav avê*
*Pênç gulî jê davê*
*Sisê li siyê*
*Dido li tavê?*

(limêj-nimêj) Pasûr

*Parçekî nan da lawikê kumsor*
*Lawikê komsor da rêza esker*
*Rêza esker avête çala gû?*

(1. ziman; 2. diran; 3. mîde) Farqîn

*Pênc birayên hev*
*Berdine pê hev*
*Nagihin hev?*

(şîşikê goreyê) Wan-Miks

*Penç heb xwişk*
*Koşkekê çêdikin?*

(şîşikê gorê) Pasûr

*Pênc heb xalên min henin*
*Li dora çalekî direqisin?*

(şîşikên goreyê û gore) Qereyazî

*Paşayek tête dinyayê*
*Du berana pê hev dixwê?*

(zarok-bebik û çiçik) Wan-Şax

*Pîrika di rê de*
*Çil sing di qûnê de?*

(dêza çilo) Şernex

*Pîra dirêj*
*Tijî qirêj?*

(kulek û dû) Pasûr

*Pîra qermiçî*
*Qirşek di qûnê  de qermiçî?*

(mewîj)

*Pir dirêj e, heta sibehî derê*
*Lê nagihe duvê kerê?*

(rê)

*Pişta min naîşe*
*Serê min diîşe?*

(stûn) Semsûr-Kolik

*Pênc bira ne*
*Birê mezin çar salî ye*
*Ê dû wî dihe salî ye*
*Birakî dû wî heşt salî ye*
*Ê dinê dû wî pênc salî ye*
*Terî(herî) dû giya(hemû)deh û sê salî ye, ev çi ye?*

(nimêj) Semsûr-Kolik

*Pênc bira ne*
*Her yekî salekî[1] ser e?*

(tilî) Semsûr-Kolik

*Pêdevê, pêezmanê*
*Hemî wexta dizanê?*

(saet) Basan

*Mamgê mino*
*Pap çû, ma danê kutayî?*

(bêjîng) Cizîrê

*Pîrê tê nava civatê,*
*Hetanî mîza xwe neke naçê?*

(çaydan)

*Pisik nine bibêje pişt*
*Û Kûçik nine bivêje oşt?*

(tir)

*Payîzê dimre,*
*Biharê ser jê dike,*
*Bele jî helal dike?*

(Navê jininikê Bihar e)

1 Kevirê pahn û fireh, ferş

*Pir pelên sîs*
*Navê wê lênivs*
*Ji bo pênivs*
*Dikeve kîs!*

(defter)

*Pelhûra pelxwê ye*
*Heçî nas nake ne ji vê dinê ye?*

(nokên şîn)

*Pira darînî*
*Koça axînî*
*Xwarin gîhayê şînî?*

(qalûn)

*Pîra mirî*
*Min du kendal bi ser werkirî?*

(mêzîn û zebeş)

*Pişo pişo nêrgiz*
*Li ber ava dengiz*
*Ne gur dixwe ne jî dibe diz?*

(pir) Qereyazî

*Polîs li hundir e*
*Şewqeya wî li derve ye?*

(bizmar) Qereyazî

*Qam qama mêşê ye*
*Bar barê gamêşê ye?*

(qebqebik-pêlav) Sûrgûcî

*Qesra spî*
*Bê pencere û bê derî*
*Tê de rûniştiye bûkeke zerî?*

(hêk)

*Qesra spî*
*Li ber derî?*

(berf)

*Quncika reş û tarî*
*Nûr lê dibarî?*

(tîrêjên rojê)

*Quncikê tarî*
*Berf lê barî?*

(eyarê toraqê) Qereyazî

*Qulçê tarî*
*Dû lê barî?*

(tiving)

*Qazî bi qîza xwe ve*
*Mela bi jina xwe ve*
*Çar sêv bi darê ve,*
*her yek yekê jê dike,*
*yek dimîne pêva? çawa?*

(jina mela qîza qazî ye) Semsûr-Kolik

*Qapaxa qûnê*
*Tama şîvê?*

(dûyê miyê-dûvê mihê) Semsûr

*Qet neza*
*Qet nezîla*
*Qet newesta?*

(1. hêstir, 2. xwê, 3. av) Pasûr

*Qesra spî*
*Ya du derî?*

(cûreyeka goreyê) Qilaban

*Qeftkî pûş*
*Li pişt kevirkî tûj?*

(simnik-milkis) Pasûr

*Qol tebançe*
*Li nava baxçe?*

(sileka sergîn) Pasûr

*Qûtiya dûdermana*
*Venabe heta axirê zemana?*

(mezel) Pasûr

*Qutiya silêmanî*
*Li ser xanî?*

(jina bi zaro) Qereyazî

*Qubba bêkulek?*

(Hêk)

*Qam tune, kum şîn e*
*Çavbeloq e, lê nabîne?*

(hêk)

*Qesrika şîn î bêderî*
*Lê mifta wê jî hêsinî?*

(zebeş)

*Qolana li piştê ye*
*Dendik tê de bi rêzê ye?*

(rext û fîşek)

*Qesra Xwedê çêkirî*
*Bayê qul tê vekirî?*

(pîvaz)

*Qesir ji goşt*
*Derece ji hesin?*

(mêzên)

*Qemçika wî heye hesp nîne*
*Baskê wî heye teyr nîne?*

(masî) Pasûr

*Qesrek bêderî*
*Tê de rûniştine hezar zerî?*

(hinar)

*Qasimê devxwar*
*Çû serê dar*
*Dar hemû ji jor de kire xwar?*

(dasa dara)

*Qotîka bêdev û ziman*
*Navê bê tu zeman?*

(tirb-mezel)

*Quto quto destê da*
*Singê sorê di pîdê da?*

(nok)

*Radibe berê xwe dide taxê*
*Nan û avê didimê têr naxwê?*

(bizin) Basan

*Radibim ser zinarekî*
*Dikutim nal û bizmarekî*
*Dengê min diçe hezarekî?*

(bang-ezan) Qereyazî

*Reş e*
*Qul e*
*Teng e?*

(tenga hespa) Qereyazî

*Refan danî ser bêndera*
*Ez dîtim, çûn sefera?*

(refê kevokan) Basan

*Rastiyê(deşt) de dikeve xazê*
*Kaşa da dikeve radizê?*

(req-kûsiya avî) Basan

*Rê ve derim*
*Tiştekî min re tê?*

(sî) Pasûr

*Reş e reş e wey qîr*
*Difire wey tîr*
*Kutilkî çêdike wey jina mîr?*

(kêzika gû) Şernex

*Roj digere*
*Şev radize?*

(pêlav) Wan-Şax

*Reş e ji teniyê reştir e*
*Bilind e ji çiyayan bilintir e?*

(qijik) Culemêrg

*Rêsiya giya,*
*Li pişt xaniya?*

(qula kurmoriy-kuna gêrekan/mêwî)

*Rêz bi rêz*
*Heta tewrêz?*

(Kolemişk)

*Reş e reş e wek qîr*
*Difire wek tîr?*

(kêç) Gundikê Melî

*Radibe sibe zû*
*Birek ga berdide dû?*

(kezî û gulî)

*Reşahiyê de dimire*
*Deryayê de jîndar dibe?*

(masî)

*Rûyê bêmû, melayê berî*
*Kurê kîjan pêxemberî?*

(dîk)

*Rê diçe, rêç tune*
*Bi lez diçe, toz tune?*

(keştî)

*Reş e, ne beq e*
*Stûr hene, ne ga ye*
*Şeş ling hene, bêsim e?*

(kêzik)

*Rojê du-sê car*
*Nan dide qazikê qûnxwar?*

(ziman)

*Rûçikandin*
*Rêsandin*
*Lê pêçandin?*

(tajî)

*Serbest digerê*
*Dera bivê yê pê ve herê?*

(pezkûvî) Basan

*Soro rît*
*Gewro avêt?*

(agir) Botan

*Ser de ar e*
*Bin de dar e*

(sincî) Wan

*Serê malê hêlan e*
*Binê malê hêlan e*
*Mal yune tê de malîvan e?*

(mirîşka navgundî) Qereyazî

*Ser gelgel e*
*Bin gelgel e*
*Çav zîq û sinbêlbel e?*

(kîvroşk) Cizîrê

*Ser gelgel e*
*Bin gelgel e*
*Çavzîq û simbêl bel e?*

(rêvaz) Gundikê Melî

*Ser mişar e,*
*Pê xepar e,*
*Heçî nezane dewar e?*

(dîk-dîkil) Gundikê Melî

*Serê govendê yek e*
*Bini govendê yek e?*

(zirnebêj û dahol kut) Cizîrê

*Sêniya mircana*
*Li serê bana?*

(stêrk) Dihê

*Sibatê heta havînê*
*Ji kul û derdan dixwînê?*

(bang) Basan

*Sê rojan li min zivirî*
*Ya çara li min bî strî?*

(gul) Basan

*Serê gelî bist e*
*Ji me re biye mamoste?*

(qelem û defter) Basan

*Ser qufilî*
*Çar nik û tilî*
*Dûv li ser milî?*

(dûpiştik) Cizîrê

*Sênîka savarê*
*Ser guhê darê?*

(hinar) Culemêrg

*Sindirîka li ser sindirîka*
*Kilîla wê li destê bûka?*

(gêresok) Qilaban

*Seyê har*
*Çû dar?*

(bivir) Qilaban

*Spî ye, ji berfê spîtir e*
*Reş e, ji reşiyê reştir e?*

(keşkîlan-cûreyeke qijik) Qilaban

*Ser avê re diçêt*
*Sêh nakit?*

(gulle) Qilaban

*Sindoqa silêmanî,*
*Li çolê danî?*

(mezil/gor)

*Sindoqa tijî têl,*
*deng dide pêl bi pêl?*

(radyo)

*Siltanê ser doşekê*
*Nir nir dike li goşekê?*

(kitik-pisîk) Hezex

*Singa min li singa te*
*Kî..ê min li qûna te?*

(gêresûk-destar) Dihê

*Spî ye spî ye*
*Ne keşk e*
*Guhbelîsok e*
*Ne mişk e?*

(Şeytanok) Dihê

*Sê pênc panzde*
*Û dido hevde*
*Û sisê bîst?*
*Dike çend?*

(bîst e)

*Serê dinê*
*Binê dinê*
*Du gidîş tenê?*

(heyv û roj) Culemêrg

*Ser ve çayir e, tê çinîn*
*Ji bin ve kanî ye, tê vexwarin?*

(mih) Qereyazî

*Serî qûnê ve ye*
*Qûn serî ve ye?*

(bêrîvan) Cizîrê

*Seriyek li jorê ye*
*Dido di binî de*
*Fistiqî qula dê de?*

(derpê jina) Qereyazî

*Sebiyê nemijandî*
*Mêrga neçêrandî*
*Kerê korê*
*Ji garana veqetandî?*

(1. melayîket; 2. cinnet; 3. şeytan) Lîcê

*Sênî li ser sênî*
*Deng diçe Hiseynî?*

(dengê ewran) Lîcê

*Sindok mindok*
*Giş li meydan?*

(mezel) Amed

*Ser ezman e*
*Bin ziman e*
*Sî û du mercan e?*

(diran) Qerecdax

*Sink(sikeh) li vir dikutim*
*Golik li wir dinepixe(diwerime)?*

(dendika zebeş) Farqîn

*Sê ling li erdê*
*Çar lingê wê qiyamê(li ber jor ve)*
*Gûyê wê li devê dê û bavê te?*

(meşk) Farqîn

*Ser şeh e û dêl das e*
*Kero bêje dîk e, ev çi ye?*

(dîk) Qereyazî

*Serî li qûnê ye*
*Qûn li erdê ye*
*Deh li didoya ye?*

(guhanê mîhê) Qereyazî

*Sê tişt hatin ser pirê*
*Yek li pirê mêze dike*
*Dibîne û pêlê dike derbas dibe*
*Yek jî mêze dike*
*Dibîne û pêlê nake derbas dibe*
*Ê din jî ne dibîne ne jî pêlê dike*
*Lê derbas dibe. Ev çi ye?*

(jinek biheml û zarokek di hembêza wê de) Qereyazî

*Serî reş e*
*Binî reş e*
*Destavêjim*
*Berdavêje?*

(tiving) Pasûr

*Sima hêstirê*
*Sed û sî û sê siwar tê de disitirê(stargeh)?*

(hinar) Pasûr

*Sihorê tik tikî*
*Bazda serê zilikî*
*Zilik li bin de hejikî?*

(dû) Pasûr

*Sindoqa silêmanî*[1]
*Dîharê(ban) xanî danî*
*Bê Xwedê kes pê nizanî?*

(jina bi bar-jina bizaro) Qerecdax

*Ser kurkirî*
*Bin kurkirî*
*Nav de hirî?*

(kulav) Qerecdax

*Serê wî kun e*
*Devê wî tûj e?*

(derzî) Semsûr

*Serî şûjin e*
*Qûn dar e*
*Dirêj e, dirêj e, dirêj e?*

(dirêşik) Botan

*Sorê kurkirî*
*Bi te re kirî?*

(kulav) Qereyazî

*Sima gê*
*Tijê xwê?*

(hinar) Qerecdax

*Serê wî heye porê wî tune ye*
*Rihê wî heye ziriyeta wî tune ye?*

(Silêman demîrel) Qereyazî

---

1 Sindoqa Silêmanî: Padişahê Osmanî ê navdar Qanûnî Siltan Silaman sindoqekî bi miftekirî her dem bi xwe re gerandiye û wesiyat kiriye dema bimire jî sindoqê bi wî re veşêrin. Lê dema ku mirî şêxûlîslam destûr nedaye ku sindoqê bi wî re bin ax kin . Şêxûlislam sindoq vekiriye û dîtiye ku tev fermanê şêxûlislam in di sindoqê de .

*Stûnikê*
*Li ser du mezela ava dikê?*
(difin-poz/mezel:çav) Şernex

*Mamkê mino*
*Sê bira daîmî difekin?*
(tifik, kuçik) Cizîrê

*Serî şeho*
*Terî daso?*
(dîk)

*Ser sipî ye ne mele ye,*
*Pê panî ye ne deve ye?*
(kifkarik-kidadik)

*Ser can e û bin can e,*
*Lê çermekî wek heban e?*
(zînê hespan)

*Sê marên reş,*
*Ji jor da xwe berdan geliyê xweş?*
(gulî, kezî)

*Ser sipî ye, Mele nîne,*
*Gurzçî ye, Pale nîne?*
(Kumê mela daye serê xwe,
lê melle nîne. Rind Gurza dipêçe,
lê nikare Qirimê bikşîne)

*Sênigo di siyê da*
*Dunigo pêda*
*Devê li ber zikê diya te*

*Gûyê wî li devê heftê bavê te*
*Tu çawa dikî kêfa te?*

(sênigo:sêpî û meşk
Dunigo:jin
Gû:rûnê meşkê)

*Sofîkî ûr pehn*
*Xwe diavêjê ser diya te heta dibe sibeh?*

(nivîn) Basan

*Sê bira bi şaşikê, çi ye?*

(sêpê)

*Serî li derve*
*Binî di erdê de?*

(sing)

*Ser morik*
*Axê dike komik?*

(xilt)

*Sêvek li darê ye*
*Çavê herkesî lê ye*
*Kes nizanê qismetê kê ye?*

(keç)

*Ser dar e*
*Bin kevir e*
*Sê serî ye*
*Deh ling e?*

(moşene)

*Sed mal bi sed sikakî*
*Tev li ser milê gayekî?*

(hinar)

*Serî reşêle*
*Binî reşêle*
*Teqletîzo çirtile?*

(meşk)

*Sibê çar ling e*
*Nîvro du ling e*
*Êvarê sê ling e?*

(mirov)

*Sindoqa çar ling*
*Dibeze mîna piling?*

(erebe-gerûnde)

*Sêvek min heye gelek xweş*
*Nêvî spî ye, nêvî reş?*

(roj û şev)

*Sed û şêst û şeş reşêlek*
*Duwazdeh ga û çêlek*
*Nîvî reş, nîvî belek*

(sal û meh)

*Ser xet e*
*Bin xet e*
*Ne pênûs e ne kaxet e?*

(pir û çem)

*Ser min ve*
*Binê dayik ve?*

(memik)

*Ser nikul e*
*Dide xweş agir e?*

(tetik tivingê)

*Sê bira nin*
*Li hev dinêrin?*
(kuçik)

*Seriyeke wê li erdê ye*
*Seriyek li ezman e?*
(keskesor)

*Sinbilûska li ser simbilûskê*
*Destmala destê bûkê?*
(sivnik-milkis) Qereyazî

*Sê bira bi şaşikekî, çi ye?*
(meşk) Culemêrg

*Sor dixwe*
*Spî dirî?*
(aş) Qereyazî

*Şev min nerî, pez girt çeman*
*Sibehê rabûm kit jê neman?*
(stêrk) Basan

*Şildim bildim*
*Heşt pê du sim?*
(şehîn û kîlo) Norşîn-Bedlîs

*Şkefta tarî*
*Tijî mirarî(hacet)?*
(dinan) Basan

*Şkevlatûka mala*
*Çûye devê deriyê xala?*
(kûsî?) Dihê

*Şem û şepal e*
*Serjêkirin betal e*
*Her sê dîna helal e?*

(masî) Dihê

*Şim şereq*
*Li dîwar req?*

(çilm) Dihê

*Şivik hişk*
*Ser kurîşk?*

(pozsimik-xizme) Qerecdax

*Şiva ter*
*Ket guher?*

(mar) Culemêrg

*Şiva hişk*
*Li guhişk*

(stre-stûr-qiloç) Norşîn-Bedlîs

*Şêr dixwim*
*Newêrim herim cihê şêr?*

(nanê binê agir) Pasûr

*Şîronek,*
*Daronek*
*Guhîpelok birêket*
*Serpîvok bi du ket?*

(kerge-baxbozumu
Şîronek:tirî
Daronek:dara tirî
Guhîpelok:hêstir
Serpîvok:mirov) Semsûr-Kolik

*Şimhûno*
*Du qûno?*

(gindor-banger) Mêrdîn-Stewrê

*Şev xatûn e*
*Roj cariye ye?*

(melkes-sivnik) Mêrdîn-Stewrê

*Şewqa herî mezin*
*Kî dide serê xwe?*

(ê serê wî herî mezin) Qereyazî

*Şil bike,*
*rep bike,*
*tê re bike. Çî ye?*

(ta û derzî) Gundikê Melî

*Şaşik li ser sera ye,*
*Bang dike, lê ne mela ye?*

(dîk)

*Şev reş e,*
*Şûv reş e,*
*Miha qember e,*
*Berxî li bere?*

(miha reş?) Botan

*Şûva reşî*
*Ew dimeşî,*
*Dil û cîger pê digeşî?*

(trên)

*Şewqa wê da newqa min?*

(eynik)

*Şkeftekî reş*
*Tijê golikê beş(bej)?*
(dev û diran)

*Şeş ben û benik*
*Du nan û kutilik?*
(şêhin û weqî)

*Şilo milo*
*Kete qul û milo?*
(dewl û bîr)

*Şikefta tarî*
*Tê de rûniştiye kûçikek harî?*
(dev û ziman)

*Şikefta tarî*
*Li ser stûnên xwarî?*
(zik û parsû)

*Şil dixime*
*Zûha derdikeve?*
(nan) Qereyazî

*Tenûrek him himê*
*Tijî nanê genimê?*
(gurbika mêşa hingiv) Dihê

*Tama şîvê*
*Kapaxa (devik) qûnê?*
(dûvê mihê) Semsûr

*Tê de tune dewsa qûnê*
*Heye dewsa stûnekî?*
(kalkevîk-kidadik) Qereyazî

*Tenûra metê*
*Kadek ketê*
*Destê kesek negihijtê?*

(heyv) Culemêrg

*Tenûra xumxumî*
*Tijî nanê genimî*
*Sibhê rabûm xetimî?*

(stêrk) Culemêrg

*Tenûra xum xumî*
*Tijî nanê genimî?*

(hêjîr) Êlih

*Tenûra him himî*
*Tijê nanê genimî?*

(gûz) Mêrdîn

*Tendûra him himî*
*Tijî nanê genimî*
*Bi şev tijî*
*Bi roj hedimî?*

(stêrk)

*Tu diçî ew têt*
*Tu disekinî ew disekinêt?*

(sih-sî) Cizîrê

*Tejî şkeftekî şiv kopal in*
*Yek jê ne rast in?*

(strû-şax-qiloç) Cizîrê

*Mamkê mino*
*Teyr firî bêçeng?*

(nêvcîrvan) Cizîrê

*Tîr ba ye*
*Kevan çerm e*
*Ji pehniyê difelite*
*Li kepê(poz) dikeve?*

(tir)-Wan-Miks

*Tiştî min heye*
*Ne tê kirîn*
*Ne tê firotin*
*Tune ji wê şêrîntirîn?*

(xew) Qerecdax

*Tiştekê min heye*
*Diçe nexşika li pey xwe çêdike?*

(lastîka pê) Pasûr

*Tiştekî min heye*
*Sê dev e*
*Devê mezin qûna te ve?*

(şal) Mêrdîn

*Tiştekî min heye*
*Li nava malê ye*
*Yek pê nizane?*

(sivnik) Hazro

*Tiştekî min heye*
*Reş e, dirêj e*
*Ne werîs e?*

(mar) Mêrdîn

*Tiştekî min heye*
*Li avê dixim naşike*
*Li erdê dixim dişike?*

(hêk) Hazro

*Tiştê tiştanî*
*Nav mêzera siltanî*
*Ji Xwedê kes nizanî?*

(jina hemle) Culemêrg

*Tiştê tiştê tiştanok*
*Binê kevirê xiştanok?*

(kûsî) Pasûr

*Tiştê minê tiştanî*
*Li paş kevirê xiştanî*
*Ne pê heye ne panî?*

(hêka kûsî) Qerecdax

*Tişteke min heye tiştanî*
*Ne pê heye ne panî*
*Her roj diçe ber kanî?*

(cer)

*Tişkî min heye*
*Wer derê*
*Paş xwe nanêrê?*

(çem) Qerecdax

*Tiştekî min heye*
*Ji tiştan tişt e*
*Bi parsî ye û bi pişt e*
*Bê xwîn û bê goşt e?*

(pel) Farqîn

*Tiştê minê tiştanî*
*Paş kevirkî danî*
*Kêra Hz.Alî li stû danî?*

(masî) Qerecdax

*Tasa mast*
*Li cihekê rast?*

(heyv) Farqîn

*Tişt in, mişt in*
*Sernivîşt in*
*Baran barî*
*Xwe guviştin?*

(çûçik, çûk) Qerecdax

*Tehta daçû*
*Av pê de çû?*

(paznûk-parzûng-safok) Amed

*Tenûra dadayî*
*Tijê nanê badayî?*

(şeran-beniyê spî) Êlih

*Tu çûyî ser zinarekî*
*Lê xist darekî*
*Deng çû hezarekî?*

(def) Semsûr-Kolik

*Tu deri(diherî) der ve*
*Ez ê sê fîta bidim te*
*Êdî tu sax nayî hundir, çawa?*

(ez ê niha fîtek bidim te,
a din jî kengê dilê min xwest) Qereyazî

*Tiştekî min heye biçûk e,*
*Tijî odekê ye ?*

(Mûmik)

*Tişt tişta tîne*
*Kul evdî mişka tîne?*

(şeh) Qerejdax

*Tu bixwî dikeve ber didanan,*
*Tu nexwî dibe gul û gulistan ?*

(dendik)

*Tasika min a cim cimî*
*Tijî ardê(arvan) genimî?*

(hêjîr) Semsûr-Kolik

*Tiştek xweşik heye*
*Xwedê ew daye,*
*Zana û roni ye*
*Heft derî lê ye*
*Kî nezane bê mêjî ye!*

(serî)

*Tuj e weke kêr e,*
*Lê pirr bi xêr û bêr e?*

(dasa nana)

*Tep tep dike,*
*Şeq şeq dike,*
*Genim bê sitar dike?*

(mîrkut)

*Tiştekî min heye*
*Li xanî malê bê rû bê dardaye?*

(pistîk) Konya

*Tişta tiştanî*
*Di nêv mîzera siltanî*
*Ji bilî Xwedê kes nizanî?*

(jina bi zaro) Gundikê Melî

*Tiştekî min heye*
*Bi rihên xwe ve daliqandî ye?*

(derî)

*Tizbî ya kalê,*
*Berê xwe da palê?*

(mar)

*Tiştekî min heye*
*Bi ro digere bi şevî xwê qurin?*

(çuçik) Konya

*Timî divilvile*
*Ziman nîne lê diştexile?*

(tilî)

*Tiştek ji tiştan*
*Ez diçim, ew nayê?*

(şop-rêç)

*Tiştekî min heye tiştok e*
*Gûyê wî li devan xweşkok e?*

(mêşa hingiv)

*Tiştekî min heye*
*Ji her tiştî re divê?*

(nav)

*Tiştekî şêrîn e*
*Lê nayê xwarin?*

(xew)

*Tehl e weke zilindar*
*Gelekan ji xwe re dike neyar?*

(ziman)

*Tiştekî min ji tiştan e*
*Li ser bana xiştan e?*

(stêrk)

*Tûj e weke şûr*
*Xweş e weke bilûr?*

(ziman)

*Teq teq tê*
*Çîzevîz tê*
*Sewta gur tê?*

(bangeran-gundor)

*Teq û req li jor*
*Li ban dixe, li jêr û jor?*

(çeqçeqa aş)

*Teyare xweş teyare*
*Çi bikim serê wê dar e?*

(werîs û heçik-heçû)

*Tenûra axînî*
*Dûkêşa darînî*
*Bû buhêra çermînî?*

(qalûn)

*Tê mîna bayê*
*Serê wê mîna gayê*
*Boça wê mîna seyê?*

(balafir)

*Timî dizire*
*Ji bavê xwe mezintir e?*

(def)

*Tiştekî min heye*
*Di qulekî de kerîkî pez?*

(moristan-kunmêwî)

*Tûtika çar çembil çi ye?*
(kûsî)

*Tiştekî min heye*
*Dinyayê de tu çi qas xwê bavêjiye*
*Şor nabe?*
(hêka neşikandî) Qereyazî

*Tiştek e*
*Dinya tev de diçiye*
*Qevdikek qirş naçiye?*
(guh) Cizîrê

*Textê rewan*
*Dîwarên reş*
*Du stêrkên geş*
*Du rêz morî*
*Du qulên tarî*
(serê mirovan) Cizîrê

*Vî milî fis e*
*Wî milî fis e*
*Li xweliyê fetise?*
(kîso-mamê mîz) Cizîrê

*Vî milî teht e*
*Wî milî teht e*
*Nêvê de şil û şeht e?*
(hevîr) Cizîrê

*Vî milî rizde*
*Wî milî rizde*
*Yekê nêvê de*
*Navê wî Evdilezîz e?*
(ziman) Cizîrê

*Vî milî dar*
*Wî milî dar*
*Di nav de sayê har?*

(mişar-birek) Wan-Miks

*Vî  milî rêx*
*Wî milî rêx*
*Di nav de*
*xweriyê(xwarina)şêx?*

(karîkê hingiv-gurbik-qowan) Wan-Miks

*Vî alî hestî*
*Wî alî hestî*
*Di navê de goştê rastî?*

(kûsî)

*Vekirî kon e,*
*girtî gopal e?*

(sîwan)

*War û war*
*Çar pê ne dewar?*

(dolap) Pasûr

*Willeh pêçî ye*
*Billeh pêçî ye*
*Famkero*
*Fahm bike ka va çi ye?*

(pêçî) Semsûr

*Weke şahîna*
*Vedikê birîna?*

(derzî) Basan

*Wey sihika nava rê be*
*Gava wext bê çêdibe?*

(sêv) Basan

*Wê hêlê teht*
*Vê hêlê teht*
*Di nav de pîra peht[1]?*

(kêç) Qerecdax

*Wekî pirpel e*
*Nivîs lê bel e*
*Bi bend û bal e*
*Ji te re heval e!*

(pirtûk)

*Wek şivanê berxika*
*Dinêre li zaroka*
*Fêrdike hêdîka*
*Zanîn û tiştika!*

(mamoste)

*Wek stêrkan diçirûske*
*Deriyê wê wek brûsk e*
*Rondik davê wek nîsk e*
*Li ser dileqe brû û bisk e*
*Kî ker nebe, wê naske!*

(çav)

*Wek kulavekî sûtî ye,*
*Ji vir heta bexda yê raxistî ye?*

(ewr)

1 Bi wateya pîrhevok an jî pîramirovxwer hatiye bikaranîn.

*Weke hêkê ye*
*Lê ji wê girantir tune ye?*

(dinya)

*Xişt û mişt*
*Çû dergehê rûnişt?*

(milkis) Dihê

*Xalê yemrîxan*
*Newala goman*
*Sê cenan*
*Duwazdeh qetûf*[1]
*Sêzdeh cendan*[2]*?*

(rez) Hazro

*Xwêhek ya te heye*
*Her roj xweliyê li xwe dike?*

(moxila arvên) Basan

*Xwêhek ya te heye*
*Her roj edav jê tê?*

(dara ben) Basan

*Xwehr û xwehr*
*Rast û şikestî?*

(stûhr-qiloç) Basan

*Xwişka min her ro*
*Baxek çavik dişo?*

(kevçî) Dihê

1 Kelik,helik,sepeta piçûk

2 Savî, sepeta mezin.

*Xanî li ser ustûnekê*
*Te rakir şûna qûnekê?*

(kuvarek-kidadik) Semsûr-Kolik

*Xatûna  ser kursî*
*Naxwe nanê tirsî?*

(çira) Semsûr-Kolik

*Xaltiya gulistan e*
*Ne ber e ne bistan e*
*Çil dergûş e li ber destan e?*

(mirîşka kurk-qup) Qereyazî

*Ximav û xar*
*Lastîk û dar*
*Tilî lê hewar*
*Li kaxizê bar*
*Tîpên yar û har*
*Digirin rêz û tar!*

(qelem)

*Xweda yê Mîhrîban,*
*ji me ra donzdeh sêva şand*
*Me yanzdeha xwarin, yekê nexwar?*

(Rojiya meha Remezanê)

*Xaniyekî gilover û spî,*
*Bê pencere, rojin û derî,*
*Tê de rûniştiye bûkeke zerî?*

(hêk)

*Xalkî xala*
*Çû pişt mala*
*Şingîn kete ezmana?*

(birûsk) Qereyazî

*Xangaka min heye*
*Serî xwe tiji raşk?*

(ecir-hêjîr) Konya

*Xan*
*Tijî mêvan?*

(dev û diran)

*Xerîn xerînç*
*Duwazdeh derînç?*

(kuncî) Dihê

*Xwar e, ne dar e*
*Dimikê, ne kar e*
*Dikişe, ne mar e?*

(av)

*Xwişka min a hilgustan*
*Ne ber e û ne bostan?*

(mirîşk)

*Xana li pişt malan e*
*Dibe kinc bi însan e?*

(pembû)

*Ya min e, min nasnakê*
*Defterên din yaznakê?*

(tilî) Basan

*Ya li ser zenda*
*Hate çenda?*

(saet) Qereyazî

*Yekî lê dikim*
*Didoyan pêva dardedikim?*

(siwarê hespan) Qereyazî

*Yek dido bawer sisê*
*Çeqlê fisê*
*Sîtila xwînê*
*Dadbalînê?*

(gurzika çilo) Dihê

*Yên ku ez dibînim*
*Tu nabînî?*

(çav) Qilaban

*Yê mirî di erdê de*
*Yê sax hat û xwe lê da*
*Yê mirî yê sax girt û li erdê da?*

(xefik)

*Yek Serî,*
*Yek pênc,*
*Didu tije,*
*Yek vala?*

(1. Xweda, 2. Nimêj, 3. bihuşt û dojeh, 4. Cîhan)

*Yekê got ayy! Milê mino.*
*Yekê got: ayy! Pişta mino.*
*Yekê got xwezka min û canê mino?*

(1. dîwar, 2 .girş, 3. bangur/banger) Gundikê Melî

*Yek tabût*
*Tê de vezelîne çil kesê tebût?*

(niftik)

*Zelê zerwan*
*Nexşê perwan*
*Ne dîn e(heye) ne îman?*

(mar) Pasûr

*Zînê reşo siwar bû*
*Kulfet pê şabû?*

(sêl) Pasûr

*Zîq û zîq*
*Du ling û heşt çîq?*

(cotyar û ga) Pasûr

*Zivistanê azab e*
*Havînê axa ye?*

(lox-banger) Semsûr-Kolik

*Zerik goştînî,*
*Girar qîrînî,*
*Hesko darînî?*

(kildank, kil û kilçov) Gundikê Melî-Şernex

*Zehf kalekî hilhilî,*
*Jê naçe çerm û dirî?*

(jijo, jûjî)

*Zana ye ziman nîne*
*Aqilmend e rû nîne?*

(pirtûk)

*Zir zir tûle*
*Eyar heye mû tune*
*Xwarin heye gû tune?*

(qirnî-kirnî) Qereyazî

*Zik li ser zik*
*Dest li ser destik*
*Karê jinik?*

(destar)

*Zûha dixime*
*Şil derdixime?*

(gema devê hespa) Qereyazî

## ÇÎBENOK - ÇIKÇIKO

*Çîk esto*
*Nika qijîro*
*Dinya pîlîro?*

(çim) Lîcê

*Ê tira zîzo*
*Xirxirê gozo?*

(rîye-birûsk) Çewlik-Dara Hênê

*Perîn pîrê min şîn o*
*Zareyî sûr o*
*Gocagî sey o?*

(zeweş) Lîcê

*Ser sûr o*
*Bin tantir o?*

(welî-xwelî) Lîcê

*Tewer tîj û tanî*
*Zara wor û lekanî?*

(ard) Lîcê

*Qela belek e*
*Xewe re berde felek e?*

(mektûb) Lîcê

*Kela wê tutekî*
*Pir nutekî?*

(êncîr) Lîcê

*Kel û qol*
*Vazda gol?*

(qîncele) Lîcê

*Ma çarşîya da girewt yew hew*
*Ma berd kîye hezar hew?*

(hinar) Lîcê

*Ma ko de dî yew kerra*
*Ma şî ewney yew ser e?*

(kesa-kûsî) Lîcê

*Çowa çewt e*
*Pey heft koya da kewte?*

(keskesor) Lîcê

*Çîk esto*
*Alûsîya day kulfetî?*

(toq-sêl) Lîcê

*Çîk esto*
*To wa besto?*

(namî) Lîcê

*Yew çîy min esto*
*To ra(ya) besto?*

(name-nav) Pîran

*Yew çîy ma esto*
*Vera weno*
*pişkilo keno*
*Peyra kew keno?*

(cirik-makîneya circirê) Pîran

*Yew çîy min esto*
*Heton yerey geyren*
*Yerey yeno fek yey akerde monen?*
(sol-kûtik) Pîran

*Yew çîy min esto*
*Heton yerey min rey ra geyren*
*Yerey yeno herinda yew ponotit vinden?*
(çowa-kopal) Pîran

*Yew çîy esto*
*Pey xora nê oynîn*
*Şono nişono nê qedin?*
(ro-aw) Pîran

*Bavkal kewt*
*Örz eyel sera kewt?*
(kîron-pird-keran-girş) Pîran

*Zomay xaloy kaşir kayme gunên*
*Nengo çîneno?*
(zerenc-kew) Pîran

*Ên kinar kaş*
*Ay kinar kaş*
*Mîyon de topay qûmaş?*
(zon-ziman) Pîran

*Yew çîy min esto*
*Don kerar çîy nêbeno*
*Awkir gunen dirêno?*
(pel-kaxiz) Pîran

*Yew çîk min esto*
*Pird ra qalin*
*Pel(kaxiz) re sivik?*
(meşk) Pîran

*Ga ora*
*Doçik pera?*

(tûfang) Gimgim

*Kelo kir*
*Kewt bir?*

(çilet-jilêt) Gimgim

*Roj geyreno*
*Şan di amekiye*
*Fekê ci akerdemeneno, çi yo?*

(sow-pêlav) Gêl

*Pontîla vaj*
*Eş dî kaş?*

(burêh-birûy) Guleman-Elazîz

*Yew dapîra mi esta*
*Xo bi bo pîne kena?*

(Toq-sêl) Guleman-Elazîz

*Yew çî mi esto*
*Xo bi xo mezelê xo keneno?*

(dalpa-dilop) Guleman-Elazîz

*Kel me henar*
*Şî zinar*
*Kerd nîkerd neame war*
*Mi yew şeple da pîro ame war*
*Hinzar gil xone erdî war?*

(erdîş-rîh) Guleman-Elazîz

*Yew şeltê mi esta*
*Tim ha awdo?*

(zon-ziman) Guleman-Elazîz

*Çerning koyti rehar*
*Duning koyti dima?*

(her-bara-merdimê) Guleman-Elazîz

*Yew axor me esto*
*Yew pontîla waj*
*Tê de ca(h) nigena*
*Yew bol bizo*
*Tê de ca(h) geno?*

(qula mîjlûro-kunmêwî) Guleman-Elazîz

*Nor di perçî dor di perçî*
*Orta di qeragoçî?*

(çîm-çav) Guleman-Elazîz

*Şak şak hem ame*
*Piyî îmam e*

(seat) Guleman-Elazîz

*Bapîr mi noverdî*
*K... g... boverdî?*

(kû-kundir) Guleman-Elazîz

*Yew çî yê min esto*
*Ez donû keraro nêşikeno*
*Ez donû aw kiro şikeno?*

(kaxido) Pîro-pîran

*Yew çî yê min esto*
*Hetonî yereyî geyreno*
*Yereyî hindîyayî*
*Yew ponc qûrûşî cageno?*

(çowa-gûpal) Pîro-Pîran

HEJMAR: 899+38= 937

## VARYANTÊN HINEK MAMIKAN

*Berhev dikî barê ga ye*
*Datînî erdê weke çiya ye?*

(kon)

*Bi roj xulam e,*
*bi şev xanim e?*

(sivnik/melkes)

*Bi şev bûk e*
*Bi roj pepûk e?*

(nivîn) Mêrdîn-Qoser

*Bi şew razam hewş tije bû*
*Sibê rabûm yek nemabû?*

(stêrk)

*Bi şev dixemilin*
*Bi roj ditemirin?*

(stêrk)

*Ber kevirî siltanî*
*Kêra Hz.Alî li istî(stû) danî?*

(masî) Semsûr-Kolik

*Binî di erdê de*
*Nîvika wî kerê de*
*Serê wî bavê te de?*

(genîm) Wan-Şax

*Binî di erdê de ye,*
*Nîvî ji kerê ye,*
*Serî ji te re ye?*

(genim)

*Bê rih e*
*Riha tîne?*

(şehê seriya û kêç) Qereyazî

*Bûk li hundur*
*Porê li derva?*

(lazût-garis)

*Çil çîq in*
*Çil berçîq in*
*Çil mifte ne*
*Çil qulfe ne?*

(Qur'an) Cizîrê

*Çil çîq in,*
*Çil belçîq in*
*Çil mifte ne*
*Çil ode ne*
*Çil têde ne?*

(Qur'an) Botan

*Çeqmeq e Çeq û req e*
*Heçî nezane ehmeq e?*

(çeqmek, dûpiştik) Botan

*Ez çûm ser ban(e)kî*
*Hat nal nala birîndar(e)kî?*

(dasik û bivir) Dihê

*Çûm nava delê*
*Ez geriyam negeriyam*
*Min şivekî rast nedît?*

(mar) Farqîn

*Çar çarix*
*Bîst û çar bençarix?*

(nal û bizmarê hespan)

*Çar bira nin,  çar diyar,*
*Yek germ, yek hênik,*
*Yek şilî û yek jî sar?*

(demsal)

*Du qulê roviya,*
*Du çirê neviya,*
*Aşek bêav di bin da geriya?*

(1. Poz. 2. Çav. 3. Dev.)

*Du mezelê şûştî veşûştî*
*Du feqe lê rûniştî?*

(gûz) Cizîrê

*Diçim diçim*
*Lê nagihime?*

(sihik) Dihê

*Diya min qesrek*
*Li ser sê stûna ava dike?*

(gore û sîxikên wê) Dihê

*Digere bi roj û şev*
*Disekine dev ji hev?*

(şekal)

*Difire per tune*
*Didûşî şîr heye, gihan tune?*

(kereng) Semsûr-Kolik

*Deh bira tên deştê*
*Her yek ferşek li piştê?*

(tilî û neynik)

*Di dinê de ji şekir şêrîntir e, çi ye?*

(xew)

*Dikeve avê şil nabe*
*Dikeve bin axê zingarî nabe?*

(zêr)

*Du rêz giya,*
*Li pişt çiya?*

(Kezî)

*Dehlekî me yî gur heye*
*Em nikarin darekî rast jêkin?*

(goma-qiloçê pez) Pasûr

*Deve bi bar*
*çû zinar?*

(Kevçî)

*Du xwişkên cînar*
*Ji hevdu nakin bawer?*

(çav)

*Dev dirêje,*
*Xwîndirêje,*
*Dest davêjimê*
*Berdavêje.*

(tiving)

*Dev dirêj e*
*Qûn qirêj e*
*Dest davêjim*
*Berdavêje?*

(tiving) Qereyazî

*Diz li hundir e*
*Serî li derva ye?*

(bizmar)

*Ew diçe hundir*
*Dûv pê re naçe hundir?*

(kevçî)

*Ez çûm Gite*
*Anî darek du gulte*
*Da nêvrana bavê te*
*Bû çirçira diya te?*

(meqes) Botan

*Ez çûm gite*
*Min anî du dargên duqulte*
*Min xist ber bavpîrê te*
*Bû şîr şîra pîrga te?*

(meqes) Qilaban

*Ez çüm şkeftekî*
*Tê de mişt e kopalê kenêrê*
*Yek kêr nehat*
*Ez destê xwe bigrim?*

(şîxê bizinê-qiloçê bizinê) Qilaban

*Ez çûm nizarekî*
*Darek rast nînbû ez bêxim destê xwe?*

(şax, stûrh) Cizîrê

*Elba(tasa) mast*
*li guhera rast?*

(hîv)

*Ez devê vedikim qûn vedibe*
*Ez devê digirim qûna wê tê girtin?*

(meqes-cabir-cewr-qelik) Lîcê

*Ez çûm şikeftekê*
*Min darek rast nedît ez bigirim bi destê xwe?*

(şaxê bizinan) Gundikê Melî

*Ez diçim, ew jî diçe*
*Ez radiwestim, ew jî radiweste*
*Ew çi ye ?*

(siya mirov)

*Ez vedikim naçe*
*Girê didim diçe?*

(benê solê)

*Garana maman*
*Girtin ser çeman*
*Bû sibe yek jê neman?*

(stêrk)

*Guhbelok birêket*
*Pêpehnok pêket*
*Şîrîno li nav piştê ket?*

(ker, zilam, dims) Norşîn-Bedlîs

*Girekek mû*
*Li çiyê belav bû?*

(mij)

*Ga bi dêr(dar) ve*
*Çû zinêr ve?*

(kevçî) Qerecdax

*Gûyê mêşa ye*
*Xwarina axa ye?*

(hingiv)

*Gihê dixwe ne bizin e*
*Hêkan dikê ne mirîşk e*
*Hişk e ne Kevir e*
*Bele ev çiye?*

(kûsî)

*Ga orî*
*pişkul firî?*

(tifenk)

*Gayê kûl li kû mexel be*
*Li wê derê giya şîn nabe?*

(agir-şewat) Dihê

*Hem hema*
*Ber çema*
*Ne gur dixwê*
*Ne diz dibê?*

(aş) Hezex

*Hanyan e, manyan e*
*Ferşê derê kaniyan e*
*Rê nade karwaniyan e?*

(qerîsek-cemed-qeşa) Botan

*Hêsin û bizin*
*Gayê mezin*
*Tev dilîzin*
*Tev dibezin?*

(pêlav û mirov)

*Hel hela bû*
*Reşhelê siwar bû*
*Piçûk û mezinê malê tev pê şa bûn?*

(beroşa xwarinê)

*Hespê şê*
*Bazda hewşê?*

(kêç) Qereyazî

*Hilindir bilindir*
*Law ji bavê bilintir?*

(ar û dû) Qerecdax

*Hilindo milindo*
*Kurek ji babê bilindo?*

(rêvas) Gundikê Melî

*Haniya maniya*
*Ferşê li devê kaniya*
*Rê neda aşvaniya?*

(qeşa-cemed)

*Ho kilo*
*heft qat çilo?*

(pîvaz)

*Hindî tiliyekî*
*Tijî xaniyekî?*

(mûmik) Culemêrg

*Ji tiştan ne tu tişt e*
*Lê belê didan xişt e?*

(pîşî-poşu)

*Mamgê mino mamanî*
*Ji Xwedê pê ve tu kes nezanî?*

(jina bi halkî) Cizîrê

*Ji hingiv şêrîntir e*
*Ji risasê girantir e?*

(xew)

*Ji hir û ba te*
*Fît li qûna te?*

(kêç) Dihê

*Kalo ji jor de têye*
*Dirik li piştê ye?*

(jîjo)

*Kalo tê ji rê*
*Tefala striyan li piştê?*

(jîjo)

*Kerê netewilandî*
*Mêrga neçêrandî*
*Berxa nemêjandî?*

(1. şeytan, 2. bihûşt, 3. Hz Adem) Norşîn-Bedlîs

*Kûça sileymanî*
*Danî li ser xanî*
*Kesî pê nizanî?*

(jina bi zaro)

*Kumikê sorik*
*Tijî morik?*

(hinar)

*Kok li ezman e*
*Serî li erdê ye?*

(roj)

*Ker zirî*
*Bişkul ji qûnê firî?*

(çifte-tifeng û fîşek) Cizîrê

*Ker zirî*
*Kuspil firî?*

(ker:tifing, kuspil:gulle) Qilaban

*Kerê bibar*
*Çû zinar?*

(dev û kevçî) Pasûr

*Ker û bar çit*
*Dûv naçêt?*

(kevçik) Şernex

*Kofiya xezalê*
*Totî newalê?*

(zîpik-teyrok) Qereyazî

*Kaloyek tê ji deştê*
*Barê striyan li piştê?*

(jûji)

*Kalo tê ji rê,*
*Bêndera stirîya li piştê?*

(jîjo)

*Ker zirî,*
*Piskul firî?*

(tifenk)

*Ker zirî*
*Bişkul firî?*

(ker: tiving, bişkul: gulle) Pasûr

*Kalê hilhelî tê ji deştê*
*Piştîkî dirî li piştê?*

(jûjî) Pasûr

*Kofiya xezalê*
*Gêr bû newalê?*

(sî) Pasûr

*Kofiya xezalê*
*Hol bû newalê?*

(hîv)

*Kaniya qinê qinê,*
*Mîr û beg dest didinê?*

(poz)

*Ker zirî*
*Bişkul firî*
*Lê ketî*
*Pê mirî?*

(tiving û guleye wê)

*Kumê tiftik*
*Tijî nutik?*

(hêjîr) Qereyazî

*Kumê tûtikê*
*Tijê nûtikê?*

(hêjîr) Qereyazî

*Komkirî barê gakê*
*Vekirî weke çiyakê?*

(kon) Gundikê Melî-Şernex

*Lemê lem da*
*Kefê kef da*
*Mer(mar)hat*
*Masîkî dev da?*

(lemba) Semsûr-Kolik

*Lalîxanê lal xeber da*
*Masî çiv da*
*Golê kef da?*

(lambe)

*Li erdê weke gîsk e,*
*Li ezman weke nîsk e?*

(eylo)

*Lebleb e*
*Li ber çem e?*

(aş)

*Mele û qîza xwe*
*Keşe û jina xwe*
*Çûne mizgeftê*
*Derketin sisê*
*Ev çawa dibe?*

(qîza melê jina keşe ye)

*Min ji darê kir hebkî*
*Min anî male hezarkî?*

(hinar) Pasûr

*Mûyê du karikan*
*Avêtine ser du darikan?*

(kon)

*Mamkê mino*
*Min dest da qûn, dev vebû?*

(meqes, cew) Cizîrê

*Min tiştek dîtî*
*Di nav de du reng av dişimitî?*

(hêk)

*Mezela şuştî û miştî*
*Du feqên çavreş tê de rûniştî?*

(gûz) Gundikê Melî

*Ne li erd e ne li ezman e*
*Hevsarê wî li destê insan e?*

(teyare) Qereyazî

*Oda şûştî veşûştî*
*Du beyzade tê de rûniştî?*

(gûz) Wan-Şax

*Odeyek şûştî,*
*Bilbilek tê de rûniştî?*

(dev û Ziman)

*Odeyek şûştî,*
*Rêzek zilam lê rûniştî?*

(dev û diran)

*Pênc xwişk şefeqê heta êvarê*
*Gora hev dikolin?*

(şîşikên goreyê) Pasûr

*Pişo pişo nêrgizo*
*Çu li ber ava dengizo*
*Ne gur dixwe ne hirço?*

(pisîk)

*Piyana mîra tehtê ket*
*Deng li dinê ket?*

(birîsk) Cizîrê

*Piçka çê*
*Bazda hewşê?*

(kêç)

*Mamkê mino*
*Pênc bira qesrekî ava dikin?*

(penc sîxikên gora) Cizîrê

*Pazê amo*
*Li devê çemo*
*Sibê rabû*
*Kit jê nemo?*

(stêrk) Wan

*Pirtika karê*
*Li ser guhê darê?*

(kon) Gundikê Melî

*Qasimê qûnxwar*
*Çû serê dar*
*Dar anî xwar?*

(Das)

*Qesra sipî ye*
*Bê derî ye?*

(hêk) Culemêrg

*Qesra sipî*
*Bêderî?*

(hêk) Dihê

*Qûn li axê, serî li qûn*
*Dest li kaniya rûn?*

(bizin û guhan)

*Qûnik di erdê de*
*Noq di kerê de*
*Serî di qûna dê de?*

(genim û ka)

*Qama wê ya kewê ye*
*Barê wê yê kerê ye?*

(pêlav)

*Quncikê tarî*
*Berf lê barî?*

(aş)

*Reş e, reş e mîna qîr.*
*Spî, spî mîna şîr.*
*Diçe diçe mîna mîr?*

(qijik)

*Rabûm ser dîwarekî*
*Lingên min ket eyarekî?*

(gîzme-cezme) Qereyazî

*Reş e reş e wek qîr,*
*kutilka çêdike wek mala mîr?*

(kêzika gû) Gundikê Melî

*Ser mişar e bê xepar e*
*Carna kes e carna mela ye*
*Tu ne ker bî dîk e?*

(dîk) Cizîrê

*Ser qulîpancî zirçone*
*'Eyar heye mû tine?*

(beq) Botan

*Serî kurkirî*
*Binî kurkirî*
*Di binê te re kirî?*

(kulav) Qereyazî

*Sor e, ne sêv e*
*Nav sipî ye, ne penîr e?*

(tivir-şêlima sor)

*Sîtila savarê*
*Li serê darê?*

(hinar) Wan-Miks

*Sîniya savarê*
*Li ser guhê darê?*

(hinar) Şernex

*Mamkê mino*
*Siminê du qûn?*

(banger-bangur) Cizîrê

*Sindoqek silêmanî*
*Ji xwedê pê ve kes nezanî?*
(pîreka bi zaro) Sûrgûcî

*Ser mişar e*
*Bin mikar e?*
(dîk) Wan-Miks

*Sêniya can*
*Tijê mercan?*
(ezman û stêrk)

*Sindoqa silêmanî,*
*Min girê da bi Rehmanî,*
*Venabi heta axirê zemanî?*
(Jina bi zaro)

*Sê heb birayên hev henin,*
*Her roj çavên hevdu derdixînin?*
(cax, şîşikên gora)

*Sêniyek mast*
*Li be(h)nekî rast?*
(hîv) Hezex

*Sêniya mast*
*Li cihekî rast?*
(heyv)

*Serî miqar, dûv mişar*
*Bang dide dost û neyar?*
(dîk)

*Sed mal sikakî*
*Ser simê gakî?*
(hinar)

*Sêniya can*
*Tijî mercan?*

(ezman)

*Serê dinê*
*Binê dinê*
*Du guhîj tenê?*

(roj û heyv)

*Sor sorkê*
*Erdê kolkê?*

(xilt)

*Senderûk ser senderûkê,*
*Kilît di destê bûkê?*

(destar-gêrûse)

*Serê mar e, ne mar e,*
*Diçêre ne kar e,*
*Çar pê ye ne dewar e?*

(kûsî)

*Serê wî li zikê min e*
*Gûyê wî li devê heftê û heft bavê te?*

(sirsûm-meşk) Qereyazî

*Ser mişar e*
*Dûv kopal e*
*Heçî nezane*
*Kero bibêje dîk e?*

(dîk) Norşîn-Bedlîs

*Sisê di sihê de ne*
*Dido li tavê ne?*

(nimêj) Dihê

*Serhilû ye ne mar e,*
*Grêkodel e ne dar e,*
*Giya dixwe ne dewar e?*

(kûsî-şkêvlatûk) Gundikê Melî

*Ser text e*
*Bin text e*
*Di nav de pîreke bêbext e?*

(kûsî)

*Sindirûka li ser sindirûkê*
*Mifte ya li destê bûkê?*

(gêrûse-destar)

*Şemûna*
*Du qûna?*

(gundor-bangeran)

*Şeqşeqî*
*Dîwar pekî?*

(bêvil)

*Şeş ben*
*Du qût û darek?*

(mêzîn)

*Şim şekî*
*Li dîwar pekî?*

(kivkirin, çilm) Cizîrê

*Şemo şek da dîwarî?*

(kilmiş-çilm) Culemêrg

*Şiva ter*
*Li guher?*

(Mar) Dihê

*Şik li minî*
*Şik li dîwarî?*

(çilm) Qilaban

*Şîrînok li darînok,*
*Darînok li guhbelok,*
*Guhbelok bi rê ket,*
*Dunigo pê ket?*

(Şîrînok: Dims.
Darînok: Pal.aqol
Guhbelok: Qantir (Hêstir).
Dunigo: Çerçî)

*Timî divilvile*
*Ziman tune lê diştexile?*

(ziman)

*Tenûra xim ximî*
*Tijî nanê genimî?*

(stêrk) Qereyazî

*Tenûra gum gumî*
*Tijê nanê genimî?*

(hinar) Lîcê

*Tenûra dimdimî*
*Tejî nanê genimî*
*Siharê rabûm xetimî?*

(stêrk) Cizîrê

*Tenûrek xum xumî*
*Tijê nanê genimî?*

(goz) Sûrgûcî

*Teyştek mast*
*Li cîkî rast?*

(hîv) Qerecdax

*Tiştanok, miştanok*
*Li ber kevirê xiştanok?*

(Kûsî-şeytanok)

*Tişteke min heye tiştanî*
*Nav mêzera kitanî*
*Ne pê heye ne panî?*

(hêk)

*Tirba (gora) xwe*
*Bi xwe dikole?*

(dilopa avê)

*Tenûra dadayî*
*Tijê kilorên badayî?*

(gwîz-goz)

*Tiştekî min heye*
*Diçe û diçe*
*Li paş xwe nanihêre?*

(av)

*Tiştekî min heye*
*Tim diçe li pey xwe nanêre?*

(çem) Pasûr

*Tiştekî min heye*
*Ji her kesî re lazim e?*

(nav) Mêrdîn

*Teq teq dike, ne dar e*
*Seri mişk e, ne mar e*
*Giya dixve, ne kar e?*

(kûsî)

*Teştek mast*
*Li guherek rast?*

(heyv) Salnameya NÇM'ê

*Tiştekî min heye,*
*Her têm li male,*
*Geh şîrîn e, geh tahl e.*

(Ziman)

*Vî milî dep e*
*Wî milî dep e*
*Tejî di nêvê de sil û sep e?*

(hevîr) Cizîrê

*Vî milî rêx e,*
*wî milî rêxe*
*Nêv de taştiya şêx e?*

(hingiv) Botan

*Vî alî teht e*
*Wî alî teht e*
*Di nav de tê*
*Pîrekî reht e?*

(spêh-spî) Pasûr

*Vî alî text*
*Wî alî text,*
*Jê derket kalekî bêbext?*

(Kûsî)

*Vî alî dar e*
*Wî alî dar e*
*Di nav de sekî har e?*

(şûr) Pasûr

*Yeka reşa dirêj e*
*Dest didim berdavêje*

(tiving) Qereyazî

*Xişt pişt*
*Li pişta derî rûnişt?*

(gêzî-melkis) Wan

*Xişt û mişt,*
*Çû li pişta derî rûnişt?*

(Sivnik-melkes) Wan-Şax

*Xanima li ser kursî*
*Naxwe nanê tisî?*

(lambe) Qereyazî

*Xalê minê bi lingekî*
*Diajo garana gundekî*

(merkut-mîrkut) Qereyazî

*Zerika (tasek) sorik*
*Tijî morik,*
*Çi qas tol bike narijin?*

(hinar)

*Ziq ziqo*
*Heşt niko*
*Du çîqo?*

(cohtkar û gayê wî) Farqîn

HEJMARA VARYANTAN: 185

## ÇEND MÎNAKÊN PIRSÊN MANTIQÎ

Refek çûk li hewa bû, çûkek jî li erdê bû. Ref ji çûkê re dibêje:

– Selamûn aleykûm ey sed çûk!

Çûk dibêje:

– Ez ne sed im. Bi du qatê we û nîvê we û çaryeka we û bi min ve em sed in. Li gor vê rewşê, refa çûkan ji çend çûkan pêk tê? (hejmara refê=36 e) Kolik-Semsûr

Mirovek çû ser erd. Av li ser erd tune bû. Kûpikek av li ser kerê girêdayî bû û ker winda bûye. Mirov destmêj digire û nimêj dike. Di vê demê de ker hat û ziriya. Û avdesta mirov şikest. ÇÎma? (ji ber ku mirov avdesta teyemûm girtiye.) Kolik-Semsûr

Mirovek bi sed panotê xwe diçe mezatê. Dixwaze sewalan bikire: beşekî ga, beşekî bizin, beşekî mih. Gayekî bi deh panota ye, bizinekî bi nîv panot e, mihekî jî bi du panota ye. Li gor vê rewşê bi vî pereyî çend ga, bizin û mÎh tê kirîn? (bersiv:40/10=4 ga; 44*2=88 bizin; 16/2=8 mÎh) Kolik-Semsûr

Agahî:

Di vê berhemê de, 899 mamikên kurmancî, 38 mamikên zazakî bi tevahî 937 mamik û 185 varyantên van mamikan hene. Û dîsa 3 heb pirsên mantiqî jî hene. Ji van mamikan 609 heban min berhev kirine, yên din jî ji van çavkaniyên  li jêrê diyarkirî, hatine berhevkirin.

Hinek Jêderk (çavkanî):

1) www.mirbotan.com

2) Ebdurehîmê Mûşê

3) www.dengemamoste.com

5) Zincirlikuyu.net

7) Salnameya NÇMê

8) Salnameya çirayê

9) Salnameya rojê

10) Miradê Gundikî